


Öcalan, parastina xwe li ser bingeha aştî û demokrasiyê amade kir

An çareserî an jî têkçûn



■ Öcalan, ji sala 93'yan û vir de dengê xwe yê aştî û demokrasiyê bilind dike. Wî ji bo hewla xwe ya aştî û çareseriyeke demokratik, piştgirî ji serokdewletên cîhanê xwestibû. Konseya Serokatiyê ya PKK'ê piştgiriya xwe bi awayekî stratejîk diyar kir. Konseya Serokatiyê da zanîn ku wê serokê wan di dadgehê de li ser navê kurdan, bo rawestandina şer û pêkanîna aştiyê bixebite. (Nûçe:R.3)

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê hate avakirin:

Xewna hezar salan pêk hat

✓ Tirs û komplekseke dîrokî û dijwar bû. Bûbû mijara çîrok, xtran û zêmarêñ kurdan.

Kurdan bi xwe digot: "Em jî nîjada kew in." Kurd li cîhanê navno bûbûn. Yekîfî her di rojeva kurdan de bû lê tiştê ku herî kêm bû jî dîsa yekîfî bû. Vê kompleksa dîrokî, roja 24'ê gulanê, li bajarê Amsterdamê skestekeke xedar xwar.

Kurdan piştî xebata çar salan Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ava kir û ji her çar parçeyêñ Kurdistanê partî, sazî û kesayetiyêñ serbixwe li hev civiyan. Her çend kongre bêyi Serokê Kurdish li dar ketibe jî, encam li gorî hêvî û daxwazêñ wî li dar ket.

(Nûçe-Sîrove:R.8-9)



Peyama Endamê KN'ya PKK'ê Mustafa Karasu:


KONGREYA NETEWEYÎ DAWÎ LI KOMPLEKSEKÊ ANÎ

E v Kongre dê têkiliyên bi gelên li Rojhilata Navîn dijîn re ku emê her dem bi wan re cîran bin, bi pêş bixe. Her wiha dê ji bo helwesta 35 rêexistinê ereb ku di dema dîlketina Serok Apo de nîşan da, bibe piştgiriyeke berbiçav. Dê kongreya me ya neteweyî hemû nirxên dergûşa gel û olan Mezopotamyayê hembêz bike û cihê xwe di dîrokê de bigire.

(Rûpel:2)

Li Tîmora Rojhilat

PEYMAN HATE GIRÊDAN LÊ ÊRÎŞ NAQEDIN



Endoznezya û Portekîzê li ser Erewşa Tîmora Rojhilat roja 5'ê gulanê di bin çavdêriya-NY'ê de peymanek girêda. Li gorî vê peymanê, dê di 8'ê gelawêjê de referandûmek pêk were. Bi baweriya xwedîyê xelata Nobelê Jose Ramos Horta, dê gelê Tîmora Rojhilat bi rêjeyeke ji sedî 90 serxwebûnê pesend bike.


(Nûçe:R.11)

Dayika Hafiz Akdemir:

"EZ Û FOTOGRAFÊN WAN IN"

Taybetiyeke çapemeniya kurdî jî, li darê dînyayê ya ku herî zêde endamên wê hatine kuştin e. Hafiz Akdemir, roja 8'ê pûşpera sala 1992'yan, li Amedê hate kuştin. Ew, duyemîn şêhîdê çapemeniya kurdî ye. Diya wî Şefkat Akdemir, ev 8 sal in li Amedê bi tena serê xwe dijî. Ji bîlî Hafiz Akdemir, kurekî wê jî ev 20 sal in winda ye. Ew niha tik û tenê ye, ligel fotografê wan...

(Şehîd:R.6)



E-Mail:s.berbang@usa.net

SAMİ TAN

**Her çiqas tiştekî bi vî
rengî ne gengaz be jî,
rayedarên tirk çavê
xwe digirin û xwe lê
diqelibînin û heta ku tê
de bixeniqin jî dê lê
bixebeitin ku çemê jiyanê
ber bi paş bizivirînin.**

Kesên ku dixwazin li ser sedemên hilweşîna Împaratoriya Osmanî tiştekî bibêjin, pêşî bi meşa leşkerên Osmanî, Yeni Çerîyan dest pê dîkin. Tê zanîn ku leşkerên Osmanî dema diçûn seferê bi şeweyekî taybet bi rê ve diçûn: Leşkeran du gav bi pêş de davêtin û gavek jî bi paş de davêtin, ji ber vê yekê cihê ku dê di du mehan de biçûna, di sê mehan de diçûnê. Ev meş li ser dîrok û derûniya tîrkan agahiyekê dide mirov; di civaka tirk te tu car pêşketin yekser û bi awayekî şoreşgerê pêk nehatine.

Bi taybetî şoreşa gelê kurd bi civakê jî hin gav dane avêtin. Bo nimûne, êdî peyva kurd li her cihî bi rihefî tê bikaranîn. Her wiha tékoşîna li bakurê Kurdistanê, dewleta tirk mecbûrî hevalbendîyeke bi partiyen Başûr re kir. Dewlet, ji bo ku wan li dijî PKK'ê bi kar bîne, pasaporten sor, mafê vekirina nûneriyê dane wan; êdî wan wekî serokê kurdên Başûr bi nav dike.

Lê bi bîryareke Wezîrê Karê

Hundîrîn ê Tirkîyeyê diyar bû ku rayedarên tirk ji vê kirina xwe poşman bûne, êdî naxwazin navê kurd û Kurdistanê li tu cihî bê bilîvkirin. Ev biryar bi şanenavê Erbil Tuşalp di Milliyeta 20'ê gulanê de wekî sernûçe hate weşandin. Di vê bîryarê de tişte balê dîkişîne, ne tenê ji bo kurdên Bakur û rîexistinê bakurî, her wiha ji bo kurdên Başûr û rîexistinê wan jî hînek bîryar hatine girtin; digel peyvîn wekî gerîla, serhildan, serhildana kurdan, tékoşîna neteweyî ya kurdan, kurd, tirkê bi eslê xwe kurd, nîjada kurd, agirbest, banga aştiyê, Kurdistanâ Bakur, Botan, Amed, Dêrsim, Serhed, Apo, milîs, ala kurdan, mebûsê kurd û ERNK, ARGK, PKK, KUK, KAWA, peyvîn mîna pêşmerge, Kurdistanâ Başûr, dewleta kurd, lideren kurd jî hatine qedexekirin. Hemû çalakiyê têkildarî kurdan, wekî teror û terorîstî hatine binavkirin. Di nava bîryarê de xala herî balkê a li ser serokê rîexistinê Başûr hatîye girtin e. Ev bîryar bi awayekî baş nîşan dide ku Dewleta

Tirk bi ci çavî li gelê kurd û rîexistinê wan dinê. Aliyekî din ê ku divê her kurdê binamûs li ser bifikire ev e; ji bo dagirkeran kurdê baş û yê nebaş ne girîng e, hemû kurd wekî hev in. Divê ev bîryar pozê hemû kurdan bîşewitîne. Nemaze jî divê pozê wan kesen ku wekî serokeşîr hatine binavkirin, bîşewite.

Tê dîtin ku dewleta tirk li ser şopa kalikên xwe ye, heta, ji wan jî derbas bûye; dixwaze li şûna gavekê du gavan bi paş de bavêje. Her çiqas tiştekî bi vî rengî ne gengaz be jî, rayedarên tirk çavê xwe digirin û xwe lê diqelibînin û heta ku tê de bixeniqin jî dê lê bixebeitin ku çemê jiyanê ber bi paş bizivirînin.

Di van rojênu ku rayedarên tirk amadekariya vegerîna rojê berê dikin de, gelê kurd gaveke dîrokî avêt û Kongreyâ xwe ya neteweyî li biyânstanê ragîhand. Em bawer in dê ev gav, xewna Ehmedê Xanî ya bi sedalan berî niha pêk bîne. Em vê bîr û baweriyê vê gava dîrokî silav dikin.

Kongreya Neteweyî dawî li kompleksekê anî

(Ev nîvîs beşek ji peyama Mustafa Karasu ya bo Kongreya Neteweyî ye.)

Ez ilankirina Kongreya Neteweyî pîroz dikim û we hemûyan bi rîz silav dikim. Berî her tişti ez li ber şehîden me ku dibin sedema jiyanâ me û şertên pêkanîna Kongreyê yên madî û manewî ji bo me pêşkêş kirine, bi rîz bejna xwe ditewînim. Di ketina sedalsa 21'ê de, ji bo ku zaafa me ya neteweyî; parçebûyîne li paş dihêle, ez spasiyên xwe ji platforma kongreyê re pêşkêş dikim.

Ez, Serokê Neteweyî ku hemû jiyanâ xwe ji bo çareserkirina pirsgirêka yekbûyîna me daye, sînorêni di serê kurdan de ji holê rakirine û yekîtiya hemû kurdan afîrandiye, silav dikim.

Neteweya kurd di sedalsa 20'an de, bi taybetî bi meşandina tékoşîna neteweyî ligel pêkanîna yekîtiya neteweyî, wekî neteweyekê bi hêz ber bi sedalsa 21'an de gav diavêje. Gava ku mirov tékoşîna gelê kurd û zanîna neteweyî hilde dest, ilankirina Kongreya Neteweyî pêkanîna peywîreke vemayî ye. Gelê kurd, bi şerê çekdarî, serhildan û pejinkariya li hemû parçeyan û herî dawî jî bi dîlketina Serok Apo re, bi rapereña li hemû parçeyan, wekî fîlî Kongreya Neteweyî pêk anye. Em niha di serbilindiya fermîkirina kongreya ku bi

awayê fîlî pêk hatibû dijîn.

Ev tişt gelekî vekiriye ku gava mirov rastiya kurdan bîne ber çavan, yekbûyîn bi xwe jî pêşketineke gelekî mezîn e. Kongreya Neteweyî wê li kurdan;

tan, nêzîktêdayîneke li derveyî pêvajoyen dîrokî ye.

Avakirina Kongreya Neteweyî di heman demê de ji bo birînen neteweyî jî derman e. Pişti ku Kongreya Netewe-

tina Serok Apo de nîşan da, bibe piştgiriyeke berbiçav. Dê Kongreya me ya Neteweyî hemû nirxên dergûşa gel û olan Mezopotamyayê hembêz bike û wekî platforma herî demokratîk û dewletemend cihê xwe di dîrokê de bigire.

Pêkhatina Kongreya Neteweyî li aliyeke em kîfxweş kîrin û hêvîdar kîrin, li aliye din bi dîlketina Serok Apo em hemû bi guman in, hêzîn mîtinger her dem xwestine serokatiyêne me yên serhildanê neteweyî û rizgariya neteweyî qetil bike. Wekî Qazî Muhemed, Şêx Seîd, Seyit Riza û li Başûrê Kurdistanê Şehîd Şahab. Dewleta Tirk a mîtinger dixwaze Serokê me Apo jî idam bike. Ji bo ku em paşê poşman nebin û dilê me rihebet, divê em rewşa wî ya dîlîtiyê wekî dozeke neteweyî bibînin û ev divê wekî karekî bingehîn ê Kongreya Neteweyî be. Mercen maddî rî nedan ku em li Kongreyê amade bin, em bi vê mesajê hest, dilîn û ramanen xwe pêşkêşî we dikin. Ez wekî endamekî Kongreyê "Dixwazim Serok Apo, bo Serokatiya Kongreya Neteweyî bê hilbijartîn." Ez ilankirina Kongreya Neteweyî dîsa pîroz dikim û di xebatêne de serkeftinê dixwazim. Bi rîz û silavîn herî germ...

Ev Kongre dê têkiliyê bi gelên li Rojhilata Navîn dijîn re ku emê her dem bi wan re cîran bin, pêş bixe. Her wiha dê ji bo helwesta 35 rîexistinê ereb ku di dema dîlketina Serok Apo de nîşan da, bibe piştgiriyeke berbiçav.

kurdên ku her dem di sendrom û kompleksa yeknебûyîne de ne, ji aliye dîrûnî ve bandoreke gelekî mezîn bike.

Em bawer dikin ku Platforma Kongreya Neteweyî wê di bernameya Kongreyê de, asta ku tékoşîna neteweyî hatîye li ber çavan bigire û wê ji bo ku karike bersivê bide daxwazên neteweyî xwe bikemilîne.

Bo pêşketinê li hemû Kurdistanê û bersivdayina pirsgirêkên neteweyî, encax bi Kongreya Neteweyî pêkan e. Di vê dema ku ev peyvir li ber me wekî jiyanâ me girîng e de, ligel vexwendinê besdarnebûyîna hin rîexistin û şexsiye-


yî ava bû, tu lîder û rîexistin bi hêsanî nikare ceger bike ku îxanetê bike û derkeve derveyî politikayê neteweyî.

Me di dîroka xwe ya neteweyî de ca- ra yekemîn e, ku di vê astê de derfet û hêviya azadiya bi dest xistiye. Ev pêşketin ji bo mîtingeran derbeke gele- kî mezîn e.

Konrgreya Neteweyî dê raxe ber çavan ku kurd li Rojhilata Navîn neteweyek e û nikare bê înkarkirin. Ev Kongre dê têkiliyê bi gelên li Rojhilata Navîn dijîn re ku emê her dem bi wan re cîran bin, pêş bixe. Her wiha dê ji bo helwesta 35 rîexistinê ereb ku di dema dîlket-

Öcalan, parastina xwe li ser bingeha astî û demokrasiyê amade kir

An çareserî an jî têkçûn



Her ku roja dadgeha Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan nêzîk dibe, nirxandinê li ser parêznameya Öcalan zêdetir dibin. Li gorî agahîyen ku me ji parêzeren Öcalan girtin, Öcalan parêznameya xwe li gorî esasên çareseriyeke astiyane û demokratik amade kiriye. Bi baweriya parêzeren Öcalan, wê roja dadgehê Öcalan, wê parêznameyeke ku ji 120 rûpelan pêk tê, pêşkesî dadgehê bîke. Digel vê yekê, Konseya Serokatiya PKK'ê ragihand ku, wan jî politikaya xwe li gorî daxwazê serokê wan ên derbarê astî û çareseriyeke demokratik de gur kirine û ew dê li gorî encama dadgehê tevbigerin. Di daxuyaniyê de bi taybetî tê ragihandin ku dadgeha Öcalan ji bo sed-sala nû fersendeke mezin e. Li gorî daxuyaniya Konseyê dema dewleta tirk di pêvajoya darizandinê de, bi awayekî tolhindîr û rikdar tevbigere, wê encamên neyîn, yên ku mirov nikaribe ragire, rû bîdin. Konseyê diyar kir ku divê ji bo astiyê şansek bê dayin. Daxuyanî wisa didome: "Şerê ku ev 15 sal in didome, gelek ziyan gîhandîye herdu aliyên şer. Ji bo vê jî divê şer bê rawestandin û rê li ber çareseriyeke demokratik, ku li ser bingeha azadî û wekhevîyê pêk tê, bê vekirin."

Ji 93'an heta 99'an Öcalan ci digot

Wekî tê zanîn PKK'ê hîn di kongreya xwe ya çaremîn de bi dest polîtikaya astî û demokrasiyê kir. Wê demê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan diyar kiribû ku, astî bêyî şer, şer ji bêyî astî pêk nayê. Li gel vê yekê Öcalan di sala 1993'an de bang li dewleta tirk kiribû û dabû zanîn ku her tiş bi riyên astiyane û çareseriyeke demokratik, diçe serî. Dîsa Öcalan ji bo konferanseke li ser çareseriya Kêşeya Kurd, ku di sala 1994'an de li Almanyayê pêk hatibû de, peyam şandibû. Wî, di peyama xwe de diyar kiribû ku, divê hewlîn bo astî û demokrasiyê gurtir û xurtir bi-

bin. Dîsa Öcalan di sala 1994'an bo BBC'yê wiha gotibû: "Riyên yekîtiya siyasî hene. Eger hevdîtinê siyasî dest pê bikin, emê dîtin û ramanê xwe yên derbarê ji nûve sazkirina Qanûna Bingehîn de bibêjin. Her wiha ewletiya wan qanûnan wê çawa pêk bê? Formûla wê jî bi me re heye. Tê gotin ku PKK'ê dixwaze ji Tirkiyeyê veqete. Ez beravajî vê yekê difikirim. Di her rewş û mercan de, ew bi politikaya cudakîriye bi ser me de tê. Em di vê rewşê de naxwazin veqetin. Dibe ku hûn ecêbmâyî bimîn. Tevgera dewleta tirk di rastiya xwe de cudaxwazî ye. Di mercen herî kêm û teng de em yekîtiyeke demokratik dixwazin."

Dema ku peyam û daxuyaniyê Öcalan bi awayekî hûrbînî bêne kolandin, tê dîtin ku Öcalan ji şes sala vir de doza astî û demokrasiyê dike. Wekî tê zanîn, Öcalan cara dawîn jî, bo parêzêren xwe gotibû, kesen ku şerê wan mezin e, wê astiyâ wan jî mezin be.

PKK ji bo astiyê ci difikire?

Li aliye din fermandarêن PKK'ê jî ji zû de ye doza çareseriyeke astiyane û demokratik dike. Hin di sala 1994'an de ji fermandarê ARGK'ê Cemil Bayik, Murat Karayilan û Osman Öcalan, di hev-peyvîneke ku rojnameya Özgür Ülkeyê bi wan re kiriye de, diyar dike ku bi her a-wayî ew perspektif û pêşniyazê serokê xwe di cih de dibînîn û ew jî ji bo astî û demokrasiyê, bo naskirina nasnameya kurdan, digel şerê çekdarî, di şerê diplomatiyê de jî bi Öcalan re ne.

Digel van rûdan, di heman demê de bi pêşniyara Öcalan, ji bo ku xebatê astiyê xurtir bibin, Parlamentoya Kurdistan ya li Derveyî Welêt PKDW hate avakirin. Wekî din di navbera rôxistinê kurdan de peyman hatin girêdan. Dûre Öcalan di salen 1996, 1997 û 1998'an de ji bo astî û çareseriya Kêşeya Kurd bo gelek serok-

Konseye Serokatiya PKK'ê ragihand ku wan jî politikaya xwe li gorî daxwazê serokê wan ên derbarê astî û çareseriyeke demokratik de gur kirine û ew dê li gorî encama dadgehê tevbigerin. Ger Tirkîye bi awayekî şerxwaz tevbigere, wê encamên ku kes nexwaze rû bidin.

dewletên cihanê name bi rê kirin. Di namayen xwe de Öcalan bi taybetî ji dewletên cihanê xwest ku ew jî piştgiriya hewla wî ya bo astî û demokrasiyê bikin.

Wekî diyar e, cara dawîn Öcalan berî ku bê girtin, li Romayê pakêtek der barê çareseriya demokratik a Kêşeya Kurd de pêşkeşî raya giştî ya cihanê kir. Li aliye din piştî ku ew hate girtin, gelê kurd û rôxistinê kurd piştgiriya hewla Öcalan ya bo astiyê kir.

Rola Ewrûpayê

Bi baweriya Öcalan di warê Kêşeya Kurd de Ewrûpa bêkesayetî ye û bêcesaret e. Lewre Ewrûpa ji bo çareseriya Kêşeya Kurd nikare roleke girîng hilgire.

Dema mirov li helwesta Ewrûpayê ya li hemberî kurdan dînihêre, li gorî standartên xwe tevnagere. Ci ji aliye qanûnî ci jî ji aliye siyasî ve. Di pêvajoya sîyasîbûna tevgera kurd de, Ewrûpayê xwest ne ji dîrê ne jî ji mîzgeftê bibe. Yanî li aliye kî nexwest ku kurdan li derveyî politikaya xwe bîhêlê, li aliye din jî nexwest ku berê Emerîkayê bide xwe.

Emerîka û Çareserî

Emerîka di çareseriya Kêşeya Kurd de xwedan rol û erkeke girîng e. Li gorî tes-pîten siyasetnasan ji bo ku Emerîka bikaribe jendermetiya cihanê bike, divê li Rojhilata Navîn û Balkanan û herêma ereban hêza xwe xurtir bike. Ji bo vê yekê li aliye kî Başûrê Kurdistanê dixe bin kontrola xwe, li aliye din jî Tirkiyeyê dixe bin kontrola İsrailê, da ku bikaribe li Kurdistanê politikaya xwe bi cih bike û nêzîkî ereban bibe. Ji bo vê jî Amerîka dixwaze, di radeya herî kêm de, Tirkîye hebûna kurdan bi awayekî qanûnî bipejrîne û mafêñ demokratik bide kurdan. Lî li aliye din şerezayen siyasî radîgînîn, ger PKK di nava çareseriye de cih negire, wê şer dijwartir bibe.

NAVENDA NÜÇEYAN

Kurtenüce

GERİLAYAN ÊRİŞ BIR SER TÜPRAŞ'Ê

25'ê meha gulanê gerîlayen ARGK'ê ,êvarî saet li dora 9'an êrîş bir ser TÜPRAŞ'a Elîhê; di êrîşde de kes nemir. Li gorî agahîyan, di êrîşa bi moşek de avahîya herêma TÜPRAŞ'ê ziyan dîtiye. Piştî êrîşa gerîyan, polîs û leşker taxâ İpragazê ku TÜPRAŞ ji li wê derê ye, xistine bin çeperê. Di encama légerînan de li dora 10 kesî hatine binçavkirin. Tevîl vê rûdanê dîsa li gorî agahîyan bi dest me ketine, li Çiyayê Bagokê jî di navbera gerîla û leşkeran de pevçûnekê rû da; di şer de leşkerek mir, çar leşker jî bi xedârî birîndar bûn. Li aliye din, Operasyona li navçeyen Amedê Lîce, Qulp Hanî û Dîcleyê roja 23'ê gulanê hatibû rawestandin, lê li ser îxbarekê, artesê ji nû ve dest bi operasyonê kir. Li gorî agahîyan itîraflar jî tevîl operasyonê dibin.

"BO KÊŞEYA KURD PEJINKAR BIN"

Serokê Komeleya Mafêñ Mirovan Akîn Birdal 26'ê gulanê li TİHV' besdari civînekê bû. Birdal di civînê de diyar kir ku yêñ ku ji bo Çalışlar û Erdost piştgiriya xwe radîgînîn, divê di çareseriya Kêşeya Kurd de jî pejinkar bin. Birdal da zanîn ku divê tu kes xwe nexapîne. Li gorî Wî, mesele ne Birdal, Çalışlar ango meseleya Erdost e, ya herî girîng tiştên ku bo çareseriye têr gotin û nivisîn in. Serokê weqfê Yavuz Önen jî di civînê de axaftinek kir û da xuyakirin ku kesen ku dixwestin Serokê Komeleyê ji holê rakin, iro dixwazin wî bixin girtîgehê.

HADEP'Î NEHATIN BERDAN

Dema ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan li Romayê bû, HADEP'ê di avahîyan xwe de grevîn birçbûnê dabûne dest-pêkirin. Ji ber wê yekê doz li dijî HADEP'ê hatibû vekirin. Doz 26'ê meha gulanê li Ehqereyê ji aliye DGM'ya yekemîn ve hate dîtin. Tevîl Murat Bozlak, 22 endamên HADEP'ê yêñ ku têr darizandin di danişnê de amade bûn. Li gel xwesteka serbestberdana parêzeren HADEP'ê, dadgehê tu kes berneda û dadgehê li hemberî vê daxwazê xwe li koriyê danî. Digel vê yekê di danişnê de ligel ku tu kes nehate serbesberdan, dadgehê ji bo endamê kevin ê HADEP'ê Mehmet Satan bîryara girtinê hilgirin.

Dewleta tirk şer bi tilyakê finanse dike

Dewleta tirk piraniya bütçeya xwe li şerê kirêt xerc dike. Li gorî raporê İnstîtuya Lékolmînê Aştiya Navneteweyî ku navenda wê li Stokholmê ye, Tirkiyeyê di navbera salên 1984–1995'an de 61 milyar dolar bi çekan da. Lewre jî Tirkîye di nava xêridarêñ çekan de, di sala 1994'an de di rîza yekemîn de ye, di sala 1995'an de dikeve rîza duyemîn û di sala 1996'an de di rîza 7'an de navê wê derdikeye pêşberî mirov.

Serbalyozê Tirk Uluç Özülken ku di Wezareta Karê Derve ya Tirkiyeyê de ji têkiliyêñ duhêli berpirs e û cîgirê şêwîkar e, li ser vê mijarê van agahiyan dide: Pereyên ku Tirkiyeyê di 14 salan de li têkoşîna bi PKK'ê re xerc kiriye gihîştiye 86 milyar dolarî, ev jî nêzî hemû deynê derve yê Tirkiyeyê ku mîqtara wî 92 milyar dolar e." Li gorî vî hesabî, di salekê de nêzî 7 milyar dolaran li şer tê xerckirin. Dîsa Serokê berê yê Tevgera Demokrasiya Nû, Cem Boyner gotibû ji sala 1994'an vir de herî kêm salê 7 milyar dolar li şer tê xerckirin. Li gorî gelek çavkaniyan jî ev pere zêdetirî 8 milyar dolarî ye. Li ser pirseke mebûsê RP'ê Azmi Ateş, Wezîrê Berevaniyê yê hikûmeta Refahyolê Turhan Tayan, dabû zanîn ku di sala 1996'an de çar fermandarêñ hêzîn Artêşa Tirk (kuvvet komutani) rojê milyonek û 250 hezar dolarî li şer xerc dike. Li gorî daxuyaniya Tayan hêzîn bejî rojê 400 hezar, jenderme rojê 80 hezar, hêzîn hewayî jî rojê 50 hezar dolarî li şer xerc dike. Dema mirov lêçûyînen Wezareta Karê Hundîrîn û saziyên têkildarî şer jî bixe nav vî pereyî, tê ditin ku rojane 3 milyon û 750 hezar dolar li şer tê xerckirin.

Dewleta tirk bi deynan û zemê dixwaze kanêñ taybet pêk bîne û bi wan şer finanse bike. Lê lêçûyînen çek û şer ew qas pir in ku ew nikare faîzê deynêñ xwe jî bide. Bo nimûne; di neh mehîn pêşîn (rêbendan û rezber) a sala 1998'an de faîza deynêñ derveyî û hundîrîn ên dewleta tirk gihîştiye 5 katrîyon û 187 trîyon 400 milyar lîrayî. Li gorî vî hesabî dewletê di sala 1998'an de her meh 576 trîyon, her saet 800 milyar, her deqîqe 13 milyar, her saniye 222 milyar lîra, wekî faîza deynêñ xwe yêñ derveyî û hundîrîn daye.

Dewleta tirk ji ber van lêçûyînen erjeng serî li rîbażen nelîrê dide. Di vî warî de sertorêñ ku pêşî têne bîra mirov; tilyakfîroşî, qumar, paqikkirina pereyên kirêt in. Li gorî agahiyan Bernameya Navneteweyî ya Bisînorkirina Karê Tilyakê ya Neteweyen Yekbûyî (UN International Drug Control Proramme–UNDCP) û Ajansa Astengkirina Karê Tilyakê (Drug Enforcement Agency) yêñ sala 1997'an pereyên ku salakê ji tilyakê bi dest dikevin 500–600 milyar dolar in. Pisporê Hesibandinê yê Lijneya Raçavkirinê ya Wezareta Maliyyeyê ya Tirkiyeyê Şinasî Aydemir diyar

kiriye ku ji vî pereyî para Tirkîye 60 milyar dolar e. Li gorî gotina Serokwezîrê berê yê Tirkîye Mesut Yılmaz, para Tirkîye di qaçaxiya tilyakê de li cîhanê ji sedî 38, li Yekîtiya Ewrûpayê ji sedî 60 e. Di sala 1994'an de buhayê tilyakê ku ji Tirkîye çûye Ewrûpayê, 50 milyar dolar e.

Li gorî nirxandina pisporan heta sala 1984'an Tirkîye di karê tilyakê de wekî pir dihate bikaranîn, lê pişti vê salê bû navend, ji ber ku di sala 1984'an de zagona diyarkirina çavkaniya serwetê ji holê rakirîye û êdî ji mirovîn ku pere li bankayan radizînin, çavkaniya wî pereyî nehatîye pirsin. Li gorî Midûrê Şaxa Malî ya Emniyeta Stenbolê Salih Gündör mîqtara pereyê kirêt ku li bazara Tir-

û 231. Hejmara qumarxaneyan jî ji 1991'ê heta dawiya 1996'an ji dehan hilkişiyaye 73'yan. Hejmara stasyonê benzînê di sala 1993'yan de 5 hezar bûye û di sala 1996'an de ji 7 hezar û 500'i derbas bûye. Di Rênişanameya (Klavuz) Qumarxaneyan de Tirkîye bi 40 heb qu-marxaneyen 5 stêri, di rîza yekemîn de tê nîşandayîn. Tirkîye di vî warî de navendê qumarê yêñ navdar ên mîna Monte Carlo û Las Vegas jî li pey xwe hiştiye. Li gorî lêkolîneke din, berî qede-xekirinê, hejmara casinoyan gihiştibû 76'an û 56 jî ji vekirinê re amade bûn. Piraniya pereyên ku ji karê tilyakê tê, li qumarxaneyan tê paqikkirin. Qumarxane ji bo pereyên ku paqij dikin % 25–30 ko-mîsyonê distin. Dahatûya her casinoyê



kiyeyê di danûstandinê de ye, di ser 100 milyar dolarî re ye. Her wekî tê zanîn para mezin a wî pereyî ji karê tilyakê hatiye, yê mayî jî ji fidye û qumarxaneyan hatiye. Li pey gotina Gündör bi tenê ji paqikkirina vî pereyî wekî bedela vî karî 5–6 milyar dolarî tê bidestxistin.

Wezareta Karê Hundîrîn a Tirkîye dîpejirîne ku Tirkîye bihuşta pereyê kirêt e. Serokatiya Şaxa Têkoşîna Bi Sûcén Rêkxistî û Qaçaxiyê ku girêdayî Midûriya Ewlehiyê ya Giştî ye, rîbâzen paqikkirina pereyên qirêj wiha rîz dike:

- 1– Avakirina şirketên parawan.
- 2– Nîvîsandina fatûrayên sexte û nepixandî.
- 3– Qumarxane û saziyên şertdânînê.
- 4– Bikaranîna karfîn krediyê yêñ ji welatên ku penaha bacê ne.
- 5– Bi pereyê pêşîn kirîna tiştinan.
- 6– Pereyên li bankayêñ welatên biyanî wekî temînat nîşandayîn û bi vî awayî jî ji bankayêñ welatê ku lê dijî standina krediyan.
- 7– Revandina pereyan bo derveyî welêt.
- 8– Kirîna ewraqen nirxdar.
- 9– Südwerigirtina ji xizmetên malî ku li herêmîn serbest tê derpêşkirin.
- 10– Avakirina şirketên tûrîzmê.
- 11– Standina mal û milk.

Bi pey daxuyaniya Wezareta Tûrîzmê ya Tirkîye hejmara hotelên 4–5 stêri di sala 1990'i de 99 bûye, di sala 1995'an de ev hejmara bûye 2 hezar û 213 û di sala 1996'an de jî bûye 2 hezar

ya rojane li dora 1 milyon dolarî ye. Bi tenê li Stenbolê ji riya paqikkirina pereyên kirêt 8.5 milyar dolar kar hatiye bidestxistin û tê texmînkirin ku li Tirkîye kara paqikkirina pereyên tilyakê li dora 24–25 milyar dolarî ye.

Li Tirkîye borsa jî warekî pereyên kirêt e. Bi gotina Cîgirê Serokê Bankaya Navendî Osman Cavit Ertan, "Li Borsaya Nirxên Menkûl a Stenbolê (IMKB) mirov ji pereyên kirêt nikare gava xwe bavêje." Serokê IMKB'ê Tuncay Artun ji gotiye li her cihê Tirkîye pereyên kirêt têñ paqikkirin" û bi vê gotina xwe jî gotina hempişeyê xwe diçespîne. Di warê borsayê de tiştekî ku balê dikîşîne jî ev eku ji sedî 27 saziyên navberkar ku hejmara wan li dora 200'i ye, bi derdorêñ ku pereyên kirêt paqij dikin re xwedan têkîlî ne. Bankayêñ Tirk jî şirîkê vî karî ne. Di salên 1995–96 û 97'an di li Hollanda û Almanyayê gelek kirayîyen (işlem) bankayêñ tirk ji ber ku pereyên kirêt paqij kirine hatin desteserkin û doz li wan hatin vekirin. Kesên pispor diyar dikin ku mafyaya tirk cihê mafyaya itâli girtiye û li Ewrûpayê serkêsiya karêñ kirêt dike.

Lê divê mirov bipirse: Ev mafya kî ye? Li gorî Rêveberê Navenda Raçavkirina Jeopolitik a Tilyakê ya Fransayê (Observatoire Geopolitique des Drogues)

es) Larousse, heke piştevaniya rayedarêñ payebilind nebe, ne gengaz e ku laboratovarêñ hilberandina madeyên tilyakê li ser piyan bimîn. Di rastiya xwe de li Tirkîye di nav karê tilyakfîroşî û paqikkirina pereyên kirêt de mafya, bûrokrat, siyasetmedar û rîveberêñ rîxiştina saloxgeriyê (îstîhbarat) û fermandarêñ artêşê hene. Li Tirkîye ev kar veguheriye sektorekê, heta bûye sektora heri gîring.

Derketiye holê ku li herêma Îzmitî çeteyan xûgi daye fermandar Veli Küçük (niha li Giresunê fermandariyê dike) û wan ji bo wî karê tilyakê jî kiriye. Bi raporê dewletê û bîryara dadgehan hatiye selmandin ku li herêma Ruhayê çeteyen li dûv mebûsê DYP'ê û serokcer-

Ev mafya kî ye? Li gorî rîveberê Navenda Raçavkirina Jeopolitik a Tilyakê ya Fransayê Larousse, heke piştevaniya rayedarêñ payebilind nebe, ne gengaz e ku laboratovarêñ hilberandina madeyên tilyakê li ser piyan bimîn.

devan Edib Sedat Bucak, bazirganiya madeyên narkotik kiriye. Dîsa derketiye holê ku Fermandarê Gurdana (tabûr) Komando ya Çiyayî ya Culemergê M. Emin Yurdakul çeteyekî mezin ê karê tilyak û bertîlxwarinê bi rî ve biriye. Li herêmîn Amed, Wan û Culemergê gelek tîmîn taybet, efser (subay) û cerdevan ji ber ku di bin çavdêriya fermandarîn de karêñ nelîrê kirine, hatine girtin. Li Kurdistanê karê tilyakê di destê Jî-TEM û efsaran de ye, lê li bajarêñ tîrkan ev kar di destê endamê MİT'ê û polisan de ye.

Di vî karî de navê kesenî mîna Alaatin Çakıcı, Abdullah Çatlı, İbrahim Şahin, Sedat Bucak, Tansu Ciller, Veli Küçük, Mehmet Eymür, Korkut Eken, Mesut Yılmaz û gelek kesenî din bi bûyera Susurlukê diyar bûye.

Ceteyen dewletê bi xwîna kurdan nepixîne û ji bo dewletê jî hatine radeyeke xeternak, lewre jî dewletê xwest wan kontrol bike, lê bi ser neket. Politîkaya dewletê ya li ser Kêşeya Kurd ew çete a-firandin. Heta dewlet xwe nede ber karê çareserkirina Kêşeya Kurd, nikare kêşeya çeteyan jî çareser bike.

Tebîni: Ev nîvîs, ji dosyaya hîqîqînasen ên li ser Doza Sedsalê ku di Özgîr Politîkayê de roja 26'ê gulanê hate weşandin, hate wergirtin û bi kurtebirî li kurmancî hate wergerandin.

Çend şayes û terkîbêñ kurmancî

BRO OMERÎ

Agirê kayê ye: tîn tê de nîn e.
Avê lê venaxwe: qet efû nake. Ji dest xwe bernade.
Aqil mû diqelêše: aqil dikare her karî bike
Bi baran be, erdê şil nake: ateş olsa cürmü kadar yer yakar.
Bibe baran li ser me nayê: xêra wî/wê ji me re nîn e.

Ba tê, çi ji tahtê dibe: tiştekî ku winda bike nîn e.
Bitirî ji gayê cot re namîne: xerabî ji kesî re namîne.
Bîra bê av, kesê bê nav: kesê bê nav, weki bîra bê av e.

Berû ji darê ket, got: 'Devê kovikê çendî fireh e: kesê ku malbata xwe na'ecibîne.
Bi tayekî xav bi hev ve girêdayî ne: tekiliya wan sist e.

Bûye heyva eydê: em li bendê ne, nehat.

Çiroka quling e: Yilan hikayesine döndü.

Çû hecê kîr, vegeiya gûzan: tiştek neguherî.

Dinya siya darê ye: xêr û xweşî ne domdar e.

Dewê ceribandî ji mastê neceribandî çetîr e: karê ceribandî her baştı e.

Dest di ser dest re ye: el elden üstündür.

Destê tu nikarî gez bikî, maç bike:

bükemediğin eli öpeceksin.

Dûr be, bi nûr be: ji hev dûr bûn çêtir e.

Dinya li serî bû tara bêjingê: maye hayırî, nema zane serî li ku bide.

Dest di dil de: jê ne bawer e (yüregi ağızında)

Devê xelkê ne doxîn e: dawiya gotinê xelkê nayê (elin ağzı torba değil ki büzesin).

Dar kurmî ra jê naçe: kesê xerab yekî baş jê çenabe.

Diwar bi guh in: dar û devî bi guh in (yerin kulağı var)

Em lawê iro: em tiştên berê ji bîr bikin (geçmişe çizgi çekelim).

Fatê were dawetê: gulê were ser tûyan

Guhê xwe deyne pişt xwe: Binêre ka bi pey de de dê çi bê gotin.

Gavek li pêş, yek li paş: ji bo tiştê ku tê pêşketineke berbiçav pêk nayê tê bikaranîn.

Giya di bin keviran de namîne: tiştek heta hetayê veşarî namîne.

Heta aqil nas kir, temen xelas kir: heta hisê wî hat serê wî, kal bû.

Ji aş û baş: dereden tepeden

Ji kevir dişikê: naxwaze tiştekî bike

Jê danaxwe: di bin gotina kesî de namîne.

Ji bo xatirê xatiran, mere diçe ser dînî kafiran: mirov ji bo xatiran her tişti dike.

Ji ber dilopê çû ber şirkê: ji derdê

biçük direvî, kete nava belayeke mezin. (yağmurdan kaçarken doluya tutuldu).

Ji neh û dehê xwe nakeve: ji ya xwe nayê xwarê

Kabê çik e: jîr û jêhafî ye.

Keroşk û sük: hirç û govend (bo tiştê bê eleqe tê bikaranîn, têde büyük dîtin ji heye.)

Kenê guran pê tê: ketiye rewşeve gelekî xerab.

Keran bi guh nekin: li her derê nebêjin. Nekin dengî.

Kesmûkê didêre: li ser tiştên vala dixebeit.

Lingê xwe di xefkan de xwariye: gelekî bi tecrûbe ye.

Min dît, tu nebîne: rewşeve gelekî dijwar bû.

Mezel ji hev û din reş kîrin: gelek ji hev û din kuştin.

Mîna ku cin ji hesin ditirse: şibandin.

Şeko, navê xwe li hevalê xwe ko: bo kesê ku sûcê xwe dixe stuyê xelkê tê gotin.

Şeb û şekir ji hev nas nake: Ji kesê xurufi re tê gotin.

Şêwra çûkan li nav garisê feqîran e: ew jî bi feqîran dikarin

Şeş û bêş lê dixe: li ber malê xwe nade.

Şeva tarî ji êvar de kifş e: tiştê ku çewt here, ji serî de diyar e.

Tiliya xwe di çav re nake: Ji yê tiral re tê gotin.

Tu kes ji xêrê naçe dêrê: tu kes bi dilê

xwe karekî giran nake.

Tu müyekî jê bikişinî, dê don di şûnê re bavêje: gelekî qelew bûye

Tu müyê xwe bi ciwanan re diquşinî: tu mîna xortan tevdigerî

Teriya müşkekî di malê de bi ard nabe: ji kesen gelekî hejar re tê gotin.

Terî kir gurz: ji bo yê ku reviyate tê gotin.

Tivingê wan bi paçan in: pevçûna wan ne ji dil e.

Tirî bû helaw: tirî gihaye (şerîn bûye)

Wek kela miqilkê (rûnpêjê) ye: ji mirovê ku zû ya dilê xwe bêje re tê gotin.

Xwedê nokan dide yê bêdiran: dema tiştek bi dest yekî ku nikare jê sûde werigire bikeve, ev gotin tê kirin.

Xeyidî ji tira seyidî: xeyidiye ne xema min e.

Xêra destê çepê li yê rastê nabe: xêra kesî nagihêje kesekî din.

Xura xwe bi destê xwe bişikîne: karê xwe bi destê xwe bike

Xwe kir şorba nexweşan: ji pîreka ku gelekî li xwe binêre re tê gotin.

Xwîn li erdê ye: kesê ku hîna dexla (zad) xwe nedaye hev vê gotinê dibêje.

Xelkê mîr dikuştin, bizgûriyan û dişuştin: xelk ci dike, tu ci diki?

Ya dilan nayê milan: her tiştê ku dil bixwaze nayê cih.

Yê biçe masiyan, qûnziwa venagere: her tişti bedela wî heye.

Zoq ne tiş e, lê Kevirê Hemo li piş e: romî ne tiş e, xopana Enquerê li piş e.

Bi xatirê we

NEJDET BULDAN



E-mail: oramarbuldan@online.de

Tê bîra min di sala 1972'yan de ji bo perwerdehiya dibistanekê bilind ez hatibûm Stenbolê. Pêwîst bû ku ez karekî jî bikim. Karekî ji bo pêwîstiyen aborî. Ez li xebatêkê digeriyan ku bixwînim û bixebeitim. Gelek mirovîn mezin ên bûrokrat jî bi nameyan harîkariya min dikir. Yanî name dabûn min ku ez xebatêkê ji xwe re peyda bikim. Li gorî nameyekê ez çûme cem xudanê şirketeke gelek mezin. Ji min re çayek xwest û nameya min a tawsîye (ji bo torpîl) xwend. Pirsa mijn kir: "Baş e lawê min, tu dixwazî çi xebatê bikî? Çi şol, xebat ji destê te tê?" Min jê re got: "Ezbenî çi xebat hebe ez dikim." Kabira hingî li nav çavên min nêrî û kenî: "Xorto ew kesê ku bibêje ez hemû xebatan dikim, rastiya wê tu xebatan nikare bibe sérî."

Mîna guhark, ew gotina kabira kete guhê min, lê dîsa min ji xwe re tu pişê negirt. Ji ber ku bi piranî jî em kurdên Ewrûpayê ji kêmasiya mirovîn pispor leşker in, siyasetvan in, xwendekar in, karker in, karmend in,

nivîskar in, gundî ne, bajarî ne, ilimdar in, welatparêz in, eşîr in, modern in, lipaşmayî ne, pêşveçûyî ne û hwd. Kurtiya wê ez ji xwe re dibêjim, dema mirov her tiş be, ne tiştek ne.

Xwendevanê hêja û birêz ez jî ne nivîskar bûm. Lê bi kurdî gotineke mezinan heye: "Cihê ku lê peza spî nebe, dibêjîne bizinan Evdirehman Çelebî." Salek û mehek e ku ez li rojnameya me Azadiya Welat dînîsim. Dema pêşniyara nivîsinê ji min re hatî, ez pir kêfxwêş bûm. Lê min dizanî ku barekî giran e. Ez ne nivîskar bûm. Bi tirkî hatibûm perwerdekirin û bi piranî min bi tirkî dixwend û car caran jî dînîsim. Bi kurdî axaftin û nivîsin ne wekî hev in. Zehmetiya kurdî ji bêsazbûna me tê. Zimanê her saziyeke me cuda ye. Di nava saziyan de jî her berpirsek xwediyê uslûbeke cuda ye. Ji van sedeman hevalên berpirs û xebatkarên Azadiya Welat pir qehra min kêşan. Her dem bi milpanî guhêne xwe dane gazinê min. Xwendevanê ji min dipirsî, digot 'ew nivîs rengê devoka te nadîn'. Min jî henek dikirin. Min digot: "Rast e, hevalên me dînîsim, navê min li binê nivîsê didîn'. Henek bûn tabî. Qehir, êrîş û belayê dewleta dagirkir têra xebatkarên Azadiya Welat nedikir, ez jî bûbûm bar û pişti li ser milen wan. Dîsa jî milpanî û fedakariyeke gelek mezin hevalên me kêşa.

Ev nivîsa min a cil û diduyan e û dawî

ye. Ji ber sedemên tenduristî û perwerdehiyê ez xatirê xwe ji we dixwazim. Di salekê de dewlet serê Azadiya Welat, ez gelek kêm jî be hînî kurdî nivîsinê bûm. Hindî ji destê min hatî, min ramanê xwe li ser hinek bûyeran û rewşan eşkere kir. Min dixwest ez bi devoka xwe binivîsim. Lê berpirsên rojnameyê jî heq bûm. Dawiyê jî ezyetekê mezin ji bo wan çedibû. Ez baş dizanim ku zehmetî ji bo we xwendevanê jî çedibû.

Bi piranî mijarên min li ser welatparêziyê bûn. Kurd di astengiyê mezin re derbas dîbin. Rewşa Kurdistanê rewşeve giran e. Kuştin, koçberî, xwîn û talan bûye rewşeve xwezayî. Têkoşîna gelê kurd bi destê kurdan û dijminan tê fetisandin. Mijareke gelek dijwar e. Dîsa jî gelê kurd digel hemû kêmasiyan di nava fedakariyeke mezin de ye.

Xwendevanê hêja mirov û kesayetî di nava gelan de têr û diçin. Mezin dîbin û dimirin. Hind bi wicûda xwe, hind jî bi ramanê xwe. Lê ez bawer dikim ku yê nemir û neşikê, gelê kurd e. Ez li ser van bîr û bawerîyan xatirê xwe ji we û xebatkarên rojnameyê dixwazim. Dibe ku nivîsen min di Azadiya Welat de dernekevin, lê gelê min her dem di dilê min de ye. Azadiya Welat jî bi hemû rengê xwe û bi riya Internetê di mala min de ye. Ji bo kêmasiyan lêborîn, ji bo gelê xwe serkeftin û azadiyê dixwazim. Hûn her bijîn.

Dayika Hafiz Akdemir Şefkat Akdemir:

Ez û fotografê wan in....!

Hafiz Akdemir, roj-namegerekî kurd bú. 8 salan di zîndanê de ma. "Rehên wî li Xebat û Riya Şoreşê, darekî ter û taze/ Guliyêne wî yêni bi fêkî, bi ser Yeni Ülke û Özgür Gündemê de xwar bûne" Ev şitla teze, roja 8'ê pûşperê sala 1992'yan li Taxa Mêrgehemêde li Kuçeya Ezîzoxlu ji binî ve hate qelandin. Di hênikahiya sibehêke havînê de, xwîma ciwanekî kurd dirije ser kevirêne bazaltî. Lîlantineke zîz li kolanê Amedê yêni labirenti olan dide...

Dayika Hafiz Akdemir Şefkat Akdemir, niha li Amedê li Taxa Mêrgehemêde di xaniyekî du qatî de bi tena serê xwe dijî. Ev serê 8 salan e ku bi tenê, ew û du wêneyên şehîdan in. Dil dikim destê wê ramûsim. Dibêje: "Na. Ev wesiyeta Hefizê min e!" Pişti çayekê, me xwe li rojén berê berda.

Hûn dikarin hinekî qala ser-pêhatiya xwe û malbata xwe bikin?

● Em ji gundê Sîsê bi ser Liceyê ve ne. Çar qîzên min çêbûn lê hîna jî tu kurên min tunebûn. Paşê, Xwedê du kur dane me. Baqî û Hefiz. Me ew pir bi delalî, bi şîr û şekir mezin kir. Baqî û Hefiz li nav malê rojekê li hev nextist. Der û cîranêne me jî ji wan pir razî bûn. Dema ew biçuk bûn, me koçî Diyarbekirê kir. Pişti şes mehan jî me berê xwe da Mêrsinê. Em pênc salan jî li Mêrsinê man, paşê em dîsa vegeriyan Diyarbekirê.

Baş e. We çawa tê derxist ku bi karê siyasetê ve mijûl dibin?

● Wan li malê qet qala siyasetê



Taybetiyeke çapemeniya kurdî jî, li darê dînyayê ya ku herî zêde endamên wê hatine kuştin e. Hafiz Akdemir, roja 8 pûşperê sala 1992'an li Amedê hate kuştin. Ew, duyemîn şehîdê çapemeniya kurdî ye. Diya wî Şefkat Akdemir, ev 8 sal in li Amedê bi tena serê xwe dijî. Serpêhatiya wê çav li mirovan dike tas. Ji bîlî Hafiz Akdemir, kurekî wê jî ev 20 sal in winda ye. Şefkat Akdemir, bi kesen wekî Leyla Zana re jî hevaltî kiriye û gelek kesen navdar jî nas dike. Lî ew niha tik û tenê ye, ligel wan fotografan...

nedikir. Pêşî Baqî û hevalekî wî diketin odayê û li dora du seatan tê de diman. Me digot qey li dersa xwe dixebeitin. Carina ez diçûm odayê, ji gotinêne wan xuya bû ku wan qala siyasetê dikir.

Rojekê, bavê wan qutiyek boyax kiribû, da ku em pê derî û pacan boyax bikin. Wê rojê Baqî destê sibe hate malê. Hemû laşê wî di boyaxê de mabû. Kete serê sibe, içar bekçî (notırvan) hate mala me û got: "Îşev lawê te û hevalen wî li ser dîwaran slogan

nivîsin. Baqî demançe li min kişand." Paşê, dema çûme kuçeyê, min bi çavê serê xwe ew dîtin, heta Kibrîs Pasajî li ser hemû dîwaran boyaxa me hebû.

Pişti vê, min çû Baqî hisyar kir û gotê: "Ewa, ewa...!" Wî jî got: "Wus be. Jixwe min ji bekçî re gotiye. Ku tiştek were serê me, ew dê bê kuştin."

Hefiz jî, carekê min mîze kir ku deh panot pê re ne. Ez li dora wî ketim û min zor dayê. Paşê got: "Ev pere ne yên min in. Me ji partiyê re berhev kirine." Wê demê hemû talebe di nava siyasetê de bûn. Baqî û Hefiz ji KUK'ê bûn.


Tesîra we an a bavê wan li ser wan zêde bû?

● Ji min ditirsiyan lê ji bavê xwe na. Ew bi ku ve biçûna, ez li pey wan bûm. Min nedîhişt ew bi cihekî ve herin. Li Mêrsinê ez carekê pê hesiyam ku çûne sînemayê. Ez çûm, min ew ji sînemayê derxistin û birin malê. Min têr li wan xist. Carekê jî Baqî mekteb li erdê hişt û reviya çû Stenbolê. Em bi pey wî ketin, me ew li Stenbolê zeft kir û anî.

Baqî du caran çû İranê û vegeriya. Lî cara sisiyan çû û êdî venegeriya. Ev bîst sal in Baqiyê min winda ye. Carekê jî Hefiz li dora neh mehan winda bû. Xeber ji me re hat ku, ew û neh hevalen wî li ser xetê hatine kuştin. Em çûn hidûdê İraqê. Ji me re hate gotin ku deh heb talebe di Çemê Xabûrê de xeniqîne. Em hatin me şîna wî danî. Pişti neh mehan derket hat. Hefiz salek li pey windabûna Baqî hate girtin.

"...Were
Were bilivîne zimanê min
yê ku hatîbû hişk-kirin
Bila bilive û bibêje
deee... Bes e Nûrheq!
bes e Engîzek
Bîne der wê hêrsa xwe
ya sedan salan
Biteqe bi rûyê xayîntiyê de
Bikuje bi hêrsa xwe
xayînên jînê
û hembêz bike Sebriyê dayika min..."

(H. Sefqan)



Mehmet Yıldız (Cuma)
17.11.1999- Nûrheq

Em bi rêzgirî û hurmetkarî di kesayetiya te de hemû şehîdên şoreşê bi bîr tînin û em sond dixwin ku em dê dilsoziya xwe ya bo şehîdan, bi geşkirina agîre şoreşê xurt bikin.

**Li ser navê
ciwanênen welatparêz ên Albistanê Meyrem Yıldız**

Hafiz çawa hate girtin?

● Hafiz, notekê dide hevalê xwe, da ku bigihîne İranê. Ew not, di nava paketa cixara hevalê wî de tê girtin. Ew jî navê Hafiz dide. 27 rojan işkenceyên xedâr lê kirin. Heş salan di zîndanê ma. Çavê min jî re birijin! Min got qey belkî ezê wî xwedî bikim...

Cara pêşî tu li ku çûyi dîtina wî?

● Wê çaxê li Hepsa Diyarbekirê bû. Esker jî bi wan re diketin hevdîtinê. Eskeran nedîhiştin ku em tiştekî ji wan re bibin. Ji min şimikek xwest, lê nehiştin ez şimikê bidimê.

Rojekê ez çum hevdîtinê ku zer bûye, eynî wekî şima. Paşê ez pê hesiyam ku ketine greva birçibûnê. Paşê li Eskişehirê 52 rojan di greva birçibûnê de ma. Me digot ew êdî nafilite.

Dema çûn hatina zîndanê we kî nas kir?

● Niha piraniya wan nayêne bîra min. Mehdi Zana û jina wî. Silhedîn (Bulut)

We û Leyla Zana çawa hevdu nas kir?

● Li ber Hepsa Diyarbekirê. Leyla pir jîhâfî bû. Carekê li Eskişehirê Leylayê gelekî dijmîn (çêr) ji eskeran re da. Tiştek ji wan re nehişt. Min destê xwe da ser devê wê û gotê: "Keçê bisikine! Wê a niha îş bînîn serê me." Lî ew nedisekimî.

Çebû. Têkiliya Hafiz û rojnameyê çawa çebû?

● Wê demê Leyla Zana li Yeni Ülke dixebeitî. Leylayê ew biribû rojnameyê. Paşê bi telefonê gef lê dixwarin, ew çavtirsandî dikirin. Ji min re got: "Segê bi hewte hewt dev li mirov nake" Hafiz guh nedida wan. Paşê cardin bi telefonê jê re gotibûn: "Dora te jî hat!" Li beriya wî li Batmanê Cengiz (Altun) hatibû kuştin.

Roja ku hate kuştin, xew lê herimîbû. Serê sibê rabû û got: "Dayê, min kir nekî îşev xewa min nehat."

Niha ez bi tenê me li vê mala xopan. Ez û fotografên wan. Ez hingî geriyam, çavê min jî ziwa bûn. Ew hevalen ku me berê hevdu nas dikir, niha kes kesî nas nake. Ez tik û tenê mame. Ez û ev fotograf in...!

Demekê bêdeng dimîne. Paşê bi dengekî zîz vê dinewhirîne:

Fakulta mîrat bişewite bi şibak e.
Berf û baranê lê kiriye qet venake
Derman li birîna-Hefiz'm nayê qet lê
nake

Tabûta Hefiz'm ji darê zêr hel e
Min şande Liceya mîrat nav mezel e
Qurban bim, heft sal e ne kaxiz e ne
xeber e

ROŞAN LEZGİN/AMED

LI NÇM ya Êzmirê

● 29.05.1999 şemî

Roja Xwarina Kurd a Kevneşopiya 32'an

Konsera Koma Şengal, saet: 17:00

● 30.05.1999 yekşem

Konferans: Keyrana huner û mirovan, saet: 17:00

Beşdar: Erol Anar



LI YÇKM'ê

● 29.05.1999 şemî

Konsera Koma Gulên Xerzan

saet: 17:00

LI BEKSAV'ê


● 30.05.1999 Yekşem

Konsera Sadık Gürbüz

saet: 18:00

Ji bo kesên dixwazin bikenin, filmek:

Avfiros



Nav: Avfiros (The Waterboy)

Derhêner: Frank Coraci

Lîstikvan: Adam Sandler, Kathy Bates, Fairuza Balk, Jerry Reed û Herry Winkler

daye û çûye, tîrsa windakirina kurê xwe ketiye dilê wê. Lewre ji ew nahêle kurik ji bin baskê wê bifire û bê destûra wê biçe cihenkî. Ji ber vê yekê ji her tişte ku wî (Adam Sandler) ji wê dûr bixe, jê re qedexe dike; lîstina gogê, bi keçan re têkîlî danîn, çûyîna dibistanê û heta heta bi serê xwe karkirin ji bê dilê wê ye. Anglo diya wî dixwaze di ji-yana Bobby Bouche de tenê ew hebe. Ji ber vê yekê Bobby gava ji karê avfirosiyê tê qewirandin ji këfa wê tê. Bobby Bouche heta 31 saliya xwe di vê rewşê de dijî. Heta ku ji alyî koçekî ve (sazûmankarê tîspekê) fîrsend ji bo lîstina gogê tê dayin wê çaxê jiyanâ Adam Sandler diguhere.

Muzika ku li tradê bê hatiye

bikaranîn û tezahûrata temâsevanan ji bi vê muzikê re bûye yek û temâsevanan şâ dike. Lîstina Adam Sandler û diya wî Kathy Bates baş e. Mirov dikare bibêje lîstikvanen takimê profesyonel ji ne xirab e. Film bi giştî di nav sehayê de hatiye kişandin, lewre dîmenê sehayâ gogê ye. Ji xeynî dîmenen sahayê wekî din di film de dîmenen mala Sandler ji cih digire. Divê mirov rola hespê wî ji bîr neke. Wekî dawî mirov dikare bibêje yê ku diwazin hînekî bikenin, bila biçin li vî filmî temâse bîkin.

CEMİL ANDOK/STENBOL


Adam Sandler dîsa dide kenandin

Film di şanoya gogê de, bi nîqaşa du sazu-mankarêne tîpe (teknik direktör) dest pê dike. Jîxwe ji bo kişandina film wan, tîpeke amerîki yê profesyonel daye lîstin û ji 8 hezarî zêde-tir temâsevan jî, bi promosyona çapemeniya herêmî, di film de rola amîgotiyê pêk anîye.

Bobby Bouche (Adam Sandler) kesekî dî-nik û ji civakê dûr e, lê gelekî bi rûmet e. Karê wî avfirosî ye. Ji ber ku bavê wî diya wî ber-

ÇAVDÊRÎ

Ronahiya mala
me; MED-TV



SERKAN BRÜSK

L i ser rola MED-TV gelek hate xeberdan. Rola wê di gelek bernameyên televizyonê bi xwe de, hate guftûgokirin. Dîsa di roj-name û kovaran de ji alyîn kesen siyasetmedar, lêkolîner, huner-mend û nivîskar ve, ji gelek awiran ve, gotar li ser dewra wê, ku di jiyanâ gelê Kurd de girtiye û dileyize hatin nivîsandin.

Li ser alyî wê yê qewîkirina hestê neteweyî, li hev nezîkirina hêzên siyasi, xurtkirin û birina ber bi standardîzekirinê ve ya zîmîn, hîşyarkirina komelanen xellê, naskirina adet û çanda gelên jérdest û bi taybetî ji, yên cîran û li ser pirsgirêkî me yên neteweyî belavkirina agahdariyê rast ku ji çavkaniyê gelê me bi xwedî dîbin.

Rola ku MED-TV dîlist, bi raya min, ji van jî hîn bêtir bû. Belê ev hemû ji di nava xwe de dihewand lê sînorêne fêdeya televizyonê, ji bo gelekî wekî yê me, hîn firehtir e û divê wisa be ji.

Televizyonê di van çend salen xwe de xewn û xeyala talankirî ya gelê me berhev kir, li qalib xist û pêşkêşî gelê me kir. Berhemîn me yên klasîk ku hema bêje li ber windabûn û mîrinê bûn, diyarı gelê me kir. Televizyon, bû pirek di navbera his û hişê me yê dîrokî û yê iro de. Ew bi hev ve girêdan. Em bi dîrokê ve girêdan. Me destkeftiyen bav û kalên xwe bi riya vê pirê dîtîn. Me pelên dîroka çanda xwe vekirin û me hişê xwe da ber. Em di nava van pelan de li tişten ku aîdê me bûn, geriyan.

Televizyonâ Med hişê me hinekî anî serê me, ji me re bû çav, guh û hesasîyeteke gelekî mezin di meselaya neteweyî de, ji me re çêkir.

Ji zarakan re, bû mamoste, bû dibistan, bû pirtûk, bû ziman, bû ron-ahî, bû hîviya pêşerojeke azad û bû kalê çîrokbeh û ew li nava mîreg û deşten Kurdistanê gerandin. Ew li hespên avî siwar kirin, ew bi Mîrza Miheme re kirin heval, serpêhatiya roviyê poçiqot ji wan re got.

Bernameya zarakan, ku navê wê Nûbihar bû, bi rastî ji bo zarokên Kurdistanê bû bihar. Bi xêra vê bernameya dewlemend zarokên Kurdistanê Rindo û Sîdar nas kirin. Bi henekîn wan keniyan, bi stranên wan dîlxwes bûn, li şîretên wan hîshîsin.

Cara yekemîn zarokên kurdan dest pê kir, nameyên bi kurdî nivîsin û li kîleka çend hevokên silav û daxwaziyê xwe, wêneyên çiyayen Kurdistanê ji, neqîşandin. Helbest li ser MED-TV, Hevalan, Şehîdan û welat nivîsin da ku di ekranen wê de werin xwendin.

Dîsa dublaj. Bi dehan film, belgefîlm û filmen zarakan hatin dubla-jkirin...

Dema ku ez van hevokan dînîvîsim Kongreya Neteweyî di civîna xwe ya pêşîn de ye û ez ji ber nebûna MED-TV'ye nikarim li vê bûyera pîroz temâse bikim!

Kurt û kin MED-TV'ye, kurd bi jiyanê ve girêdan. Tama xweşîya jiyanâ bi kurdî da me kurdan. Sebeb ev bû ku dijmin dev ji hemû karên xwe berdabû û ketibû pey girtina vê aleta bi qedr û qîmet. Me hemûn ji dît: ji alyekî ve bi riya dewletan û ji alyekî ve bi riya sinyalên xwe yên terorist, bîst û çar saetan bi dû televizyonâ me de bû. Dawiya dawî ji bi hevkariya NATO xwe gîhand meqsedê xwe.

Lê di devera ku MED-TV lê hate bêdengkirin de, iro kanaleke din bi kurdî distre. Ev ji têkoşîna gelê me ispat dike. Berxwedaneke ispat dike. Divê em dest keftinên xwe yên neteweyî wisa asan bi dest dijminan ve bernedin. Û divê em ji bîra nekin ku hîna em di nav çavê alemê de ne, ji ber vê ji, divê em ji alyî xwe kîmasiyan nexinê.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê hate avakirin: Xewna hezar sa

Pişti xebatên çar salan, damezrandina Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê KNK'ê hate ragihandin. Kongre, roja 24'ê gulanê li serbajarê Hollandayê Amsterdamê, bi besdariya 180 delegeyi pêk hat. Digel gelek nûneren gelek partî, rôexistinê Kurdistanî, gelek kesayetiyen ji her çar parçeyen Kurdistanê jî besdarî di KNK'ê de kir.

Kongre, pişti ku siyasetmedar û rewşenbîr İbrahim Ehmed delegeyên Kongreyê silav kîrin, li pey xwendina Ey Reçib bo hemû cihanê hate ragihandin. Di qonaxa pêşin de, wê Kongre ji 29 partî û saziyan pêk were. Di nava delegeyên KNK'ê de navê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, mebûsen kurd Hatip Dicle, Leyla Zana, Orhan Doğan û Selim Sadak, ku li Tirkîyê girtî ne, jî hate xwendin.

Endamên KNK'ê sond bi zaravayên kurdî; soranî, kirdkî, kurmancî, goranî, lorî û bi zimanê asûrî xwar. Sond wiha ye: "Ez li ser rûmeta xwe sond dixwim û soz didim ku ez dê di hemû xebatên xwe de berjewendiyên gelê Kurdistanê biparêzim, gelê Kurdistanê bi pêş ve bîbim û li pey Qanûna Bingehîn ya Kongreya Neteweyî bimeşim."

Li aliyê din Komîteya Navendî ya PKK'ê bo Kongreyê peyamek ragihand û wiha got: "Her dema ku hêzên neteweyî rol û erka xwe ya dîrokî pêk bîmin, wê azadiya kurdan nêziktir bibe."

Roja 26'ê gulanê di civîna Lijneya Giştî ya KNK'ê de bîryara mafê çare-nûsê yê gelê kurd bi hevdengî hate pejirandin. Her wiha ji bo Kongreyê pênc organ, 11 komîsyon û 2 jî cîgirê serok hatin diyarkirin. Li gorî vê organên KNK'ê ev in: Lijneya Giştî, Konseyâ Kargeriyê, Lijneya Şêwrê, Komîteya Berz ya Qanûnê û Lijneya Disiplinê. Di vê civîna de duyemîn de, beşa Pêşnûmaya Peymana KNK'ê ya bi navê "Mafê Bingehîn, Desthilatdarî, Gelê Kurdistanê, Kurdistan" hate niqaşkirin.

Çapemeniya Kurd

**İsmet Kayhan/ Özgür Politika
"Her kes li benda dengê Wî bû"**

... Rojnamegera misri ya kurdnijad Duriye Awni got: "Kurd bi awayekî serketî dikevin sedsala nû. Lî ez bi tîsteki geleki diêsim, ew jî nebûna Serokê Neteweyî yê kurdan, kesê ku bingeha van rojan daniye, Abdullan Öcalan e. Xwezi ew jî li vê derê bûya!"

... İbrahim Ehmed dema axastina ve-kirinê kir wekî bizotê bû û dilgesiyeke xurt di çavên wî de dihate dîtin: "Edî ku ez bimirim jî, ne xem e. Ez ne 80 salî me, ez wekî mirovîkî 20 salî me."

Li aliyê din, roja sêyemîn ya kongreyê jî Serokê Giştî yê PKK'ê wekî Serokê Rûmetê yê KNK'ê hate pêşniyarkirin. Her wiha heft endamên Konseyâ Rêveberiyê û 11 serokên komîsyonan hatin hilbijartin.

Li aliyê din Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, endamên PKK'ê yên di girtigehê de M. Can Yüce, Müzaffer Ayata, Sabri Ok, girtiyê ji doza PRK-Rizgarî Ahmet Güven, Zanyar Ismail Beşikçi û mebûsen DEP'ê Leyla Zana, Hatip Dicle, Orhan Doğan, Selim Sadak wekî endamên rûmetê yên Kongreyê hatin pejirandin.

Li pey vê yekê çar bendên vê besê wiha ne:

Benda 1:

a) KNK, ku dê êdî wekî 'Kongre' bê binavkîrin, berzîrîn otorîteya siyasî ya Kurdistanê ye û bi şertê ku vê peymanê pesend bike, ji partî, saziyên azad û ci-vakî, nûneren civatên çandî û olî û kesayetiyen serbixwe yên Kurdistanê pêk tê.

b) Îrade û berjewendiyên gelê Kurdistanê bingeha erk û desthilatdariya Kongreyê ne.

Benda 2:

a) Kurdistan navê welitekî yekpare ye, ku lê endamên bawerî û olên cihê dijîn, zaravayê cuda hene, piranî gelê kurd ê xwedan dîroka dêrîn lê dijî, bi awayekî sunî hatiye parçekirin û li Rojhîlata Navîn e.

b) Bi zor û çewsandinê koçberkîrina kurdan ji Kurdistanê û ji aliyê dagirke-ran ve li şûna wan bicihkîrina komên din, ne tiştekî rewa ye û pejirandina vê yekê ne pêkan e.

c) Têgîna gelê Kurdistanê

1- Kurd

2- Gelên ku ji dirêjahiya dîrokê ve li Kurdistanê dijîn û xwe wekî kurdistanî bi nav dikin, asûrî-suryanî, ermenî û gelên din in.

Benda 3:

a) Her kesê kurdistanî bêyî cuda-

hiyên nijadî, zimanî, cinsî, mezhebî, bawerî li hemberî qanûnan hevmaf e.

b) Kurdî, zimanê fermî yê Kurdistanê ye.

c) Li deverên ku gelê asûrî-suryanî lê pir e, ligel kurdî zimanê asûrî-suryanî jî zimanê fermî ye.

d) Birêñ din ên ku gelê Kurdistanê pêk tînin, bêyî ku ziyanê bigihînin yekîtiya welêt û berjewendiyên giştî, dikarin çand û nasnava xwe ya neteweyî bi pêş bixin, bi awayekî azad bi zimanê xwe perwerdehiyê pêk binîn, xwe saz bikin û bi rê bixin.

e) Bêyî ku ziyanê bigihînin berjewendiyên Kurdistanê û yekîtiya neteweyî, her kurdistaniyê xwedî ol, mezheb û bawerî, dikare bi şîweyekî azad saziyên xwe ava bike û pêwîstiyên xwe yên olî bi cih bîne.

Benda 4:

Gelê Kurdistanê wekî hemû gelan xwedan mafê çarenûsê ye.

YNK: Kongre kurdan temsîl dike

Li aliyê din nûneren YNK'ê, ku wekî çavdîr li Kongreyê amade bûn, Mam Rostem û Dîdo Babaşex diyar kir ku KNK'ê kurdan temsîl dike. Nûneren YNK wiha axivîn: "Ku ev Kongre gelê kurd temsîl nake, ma karê me li vê dere çi ye? KNK payeberzîrîn saziya Kurdistanê ye. Jixwe vê yê di rîznameya wê de jî cih girtiye."

Digel vê yekê, avabûna KNK'ê li Kongreyâ Amerikayê jî bi axastina endamê Kongreyê Bob Filner hate rojevê. Filner, da zanîn ku kurdan kongreyâ xwe ya neteweyî pêk anîye, da ku dengê xwe bigihînin xwişk û birayên xwe yên li seranseri cihanê. Wî got: "Ez avabûna kongreyâ ku nûnertiya gelekî bi qasî dîroka mirovahiyê kevn, silav dikim." Filner her wiha rewşa gelê kurd rave kir û ligel vê helwesta DYD'ê rexne kir.

Yaşar Kaya jî digot: "Xwezi Musa Anter jî li cem me bûya."

... Di nav endamên KNK'ê ligel gelek siyasetmedarên navdar 'Ew' jî hebûn. Pêşin dengê Cemil Bayik û Murat Karayılan li avahiya dîrokî olan da. Peyra dengê berxwedêre nemir Zîndana Amedê Mustafa Karasu lê bilind bû. Deng bi vê yekê xilas nebûn, dengê Leyla Zana û Hatip Dicle li ber guhê besdaran ket.

Lê guh û çav her tim bendewarê dengekî bûn! Dema ku ços herî boş bû, ev yek pêk hat. Lewre dîrok dihate nîsîn. Divê her tişt békemanî bûya. Ji

nişke ve deng ji kesî û ji tu tiştî nehat. Kongre li ber dilan bêhtir şerîn bû, dema ku endamîya Serokê Giştî yê PKK'ê hate ragihandin. Dema em ketibûn taya amadekirina nûcayan, ji Kurdistanê dengûbasek hate ragihandin, gerîla silav li Kongereya Neteweyî kîribû, avetibû ser gurdaneke gerok (seyyar tabur)...

I. Metin Ayçiçek/ Özgür Politika

"Ezê li cem dilê li İmraliyê rûnim"

... Wê li ber derî Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Şêx Mahmûd û Qazî Mîhemed bi dilgermî werin pêrgîniya

PARTİ Ü

KURD

Nûnerê Partiya Cepen Kurd li Su
niyê (PCK-S) yê Ewîrûpâye Haci Sole
man:

Her roja ku Kongreya Neteweyî nayê damezirandin, wê kêmâsi û şiyen kurdan zêdetir bibin. Çawa ku bîn mirovan nan û av pêwîst e, bo kurdan Kongreya Neteweyî pêwîst e. Gîrtin Öcalan bi tenê jî, ji bo damezirandin dezgeheke bi vî rengî sedem û hincet ey Divê em xwe ji partîperestî û rôexistiye perestiyê bidin alî.

Endamê Komiteya Navendî ya Partiya
ya Sosyalistê (PSK-S) kurd li Sûriye
Nûri Hesen:

Kongre ji bo kurdan lîjneyeke pîroz û dîrokî ye. Vê dawiyê em bêhtir di vî yekê gîhîstin. Ji bo dijmin bersiva başo tirîn yekîtiya kurdan e. Xebatên me yê di nava Kongreyê de, divê hemû ji bo a-zadiya Serok Apo bin. Ji ber ku doz û armanca wî damezrandina Kongreya Neteweyî bû. Em bawer in, iro me dax-k waza wî bi cih anî.

Nûnerê Ewîrûpâye yê Bizûtneweyî
Demokraşîxwazanî Kurdistan Bekîte
Hesen:

Kongre divê bernameyeke pêşkeshî kurdan bike û di warê diplomatîk û pêkanîna bîryaran de bibe lijneye rajonî tirîn. Her wiha divê Kongreya Neteweyî yî bîryara şer û aştiyê bide û bingeha vê çekê amade bike.

Berdevkê delegasyona Partiya Rizgarîya Kurdistan (PRK-Rizgarî) Faruh
Muhsinoğlu:

Ligel hemû asteng û bergirîyen da-girker û hevkarê wan, Kongreya Neteweyî hate avakirin. Me bawerî heye, dê Kongreya Neteweyî peywir û binbariyê xwe yên dîrokî pêk bîne û her wiha dê pêsiya tekoşîna neteweyî ya Kurdistanê veke.

min. Ne Seyid Riza ne jî Şêx Seîd, dema ez dîtim wê madê xwe tirş bikin. Ezê Egît û Mazlûm hembêz bikim û pişti salan careke din Pir...

Ezê di dirêjahiya civînê de, her tim li cem dilê ku li İmraliyê şîn tê, rûnim. Emê dest bidin hev û din û li dijî zîlmê têkoşîna gelan ji nû ve bîafîrînin. Wê dilê min iro ligel dilê ku li İmraliyê hildiavêje, hilbavêje û emê dîsa bi hev re strana me ya hevpar a têkoşîne bis-tirîn. Li İmraliyê dê êdî kulîlkên kesk û sor û zer bîpişkîvin. Ez dê silavê Che bêjîmê, di ser Sierra Maestra re heyâ Behra Reş û Torosan...

an pêk hat

KETİYÊN

NÎ:

Mihemed (85):

1937'an dagirkerên Kurdistanê urdan bûbûn yek. Ji vê salê vir xeyala vê kongreyê dikim. Vê xovareke ku ji aliyê ezidîyêni li binê ve tê weşandin de, wisa ha: "Divê kurd li dijî dagirkeran nîn saz bikin. Vê nivîsê tesireke namin kir, lewre min got divê li eyan kurd bibin yek. Vê xeyala nîn ku ez çüm cem Serok Apo û Mihemed Resûl beheteyen Neteweyî kir. Serok Apo ji eta hetayê li piştâ we me."

Seddîn Huseynî:

ozongre bêhempa ye. Ev sed salî parçeyê xwe her tê dikoşin lê şomkujiyêni xwe ranawestînin. Vê di warê madî û manewî de aîn yek. Kurd berê ji hev belav û dibûn destikê hêzên derive. Lî va berdewam nake. Çawa ku kî dişe, serê wî jî dişe, divê visa bin. Dema parçeyekî ês û ahd, divê parçeyekî din pêjna vê ihe. Berê min xeyala bûyerên wi nedikir lê dinya guherî, divê siye li rewşa nû bînin.

Ülmet Serif Wanly:

emeke me ya girîng jî destnî stratejiyeke neteweyî ye. Carenûsa kurdan yek e. Maflî carenûse heye, ji bo vê yekê ji stratejiyek bê destnîsankirin. Min hî, dê KNK mezintir bibe û pardan li hev kom bike. Lî ji bo kî hîna zû ye.

Kaya:

dîroka Kurdistanê de tu caran neteweyî pêk nehatiye. Dost û kurdan her tim behsa yekne û dan kiriye. Lî KNK, ji her çar Kurdistanê partî, rîxistin û yian di nava xwe de dihewîne. Bi baweriya min, ev ji bo van bersiveke dîrokî ye. Kongreya yî, ne kongreya tu partî û rîxist. Ya gelê kurd û nûnerên wî ye. Kongre bibe mîjîye kurdan. Dîr di bin sîbera Kongreya Nete li hev bîcîvin, problemen Kur yîn xweserî çar parçeyan bibe

Nûnerê Bizûtneweyî Demokrasîx-Kurdistan Bahattin Nûri:

K'ê gewretirin partiya Kurdistan. Lewre besdariya wê ya di de cihê şanazî û dilweşîyê ye. PDK û YNK û şerê PKK û



Bo Kongreya Neteweyî ku li Hollandayê pêk hat, ji çar parçeyen Kurdistanê rewşenbîr, hunermend, nivîskar û hwd. li hev civiyan.

PDK'ê bê saffkirin. Rewşa Ocalan ji bo hemû kurdan windahîyeke mezin e, lewre ew li her çar aliyê Kurdistanê sembola azadiyê ye.

Corc Aryo (Nûnerekî gelê asûrî-suryanî):

Em ji bo standina mafê xwe nehatin vê derê. Armanca xwe xurtkirina biratiya her du gelan e. Dijmin ji bo ku her du gelan li hev sor bike, gelekî xebat kir. Ev du sal in ji bo biratiya her du gelan, têkoşîneke mezin hate dayin. KNK jî di vî warî de gavake berbiçav e. Her wiha li cem zimanê kurdi, li deverên ku asûrî-suryanî lê dijîn, zimanê asûrî wekî zimanê fermî hate pejirandin. Ev ji bo biratiya gelan gaveke mezin e.

Suheyî Qazî (Keça Mihemed Qazî):

Tu dibê qey ez cardin ji dayika xwe bûme. Girîngiya KNK'ê gewre ye û neyê ser zimên. Ez di Kongreyê de serxwembûna Kurdistanê dibînim. Min tu tişti ji yîn ku besdari KNK'ê nabin, fêm ne-

kir. Li me dereng e. Ên ku besdar nabin, bi tenê xwe ji doza Kurdistanê dûr dixin.

Emîr Qazî (Serokê Partî Serbexoyî Kurdistan):

Tîşten bi vî rengî di dîroka Kurdistanê gelekî kêm in. Ên ku besdarî KNK'ê nabin, ji yekîtiya Kurdistanê ditîrsin. Wê Kongre li çar aliyê Kurdistanê wekî bombekekê deng vede.

Mezher Xeliqî (Hunermend):

Min bawer nedikir ku dê rojeke wisa bibînim. Ne tenê kurd, cîhan jî li benda rojeke wiha bû. Bi raya min, ên ku besdarî KNK'ê nebûne jî, dê besdar bibin. Ev gava yekemîn e, dê pêsiya tîşten mezentir veke. Divê hunermendê kurd jî vê roja dîrokî bi hunera xwe ragîhîn û erka xwe pêk bînin.

Tîbinî: Ev nûce bi agahiyêni ku ji Rojnameya Özgür Politika û Ajansa DEM'ê hatine wergirtin, hate amadekirin.

BESDAREN BIYAN ILISER

KNK'Ê CI GOT:

D i civîna bo ragîhandina KNK'ê de gelenek siyasetmedar, rewşenbîr û hunermendên biyanî jî amade bûn.

Walter de Cesaris (Mebûsê Partiya Komunist ya İtalyayê):

Hikûmeta İtalyayê û welatên ewrûpî ji bo xwederbirina kurdan tişte ku ket ser milê wan, pêk neanîn. Em piştgiriya têkoşîna we dikin. Lî ji bo ku hûn ji me bêhtir piştgiriya têkoşîna me dikin, em spasiyên xwe pêşkeshî we dikin.

Angelina Fankhauser (Mebûsê Partiya Sosyalist ya Swîsreyê):

Ji bo çareseriya Kêşeya Kurd, dema çew-sandin û zora navneteweyî hatiye. Swîsre jî di vî warî de binbar e. Vê binbaryê dema Peymana Lozanê dest pê kiribû. Bî dîtina me bêyî piştgiriya navneteweyî Kêşeya Kurd naçe serî.

Neol Parish (Mebûsê Parlemenotoya Gallerê):

Ev kongre, piştî xebatên hêja pêk hat. Lewre ji bo pêşeroja kurdan geleki girîng e. Em dê piştgiriya KNK'ê bikin.

Lyudmila Bezaglaya (Endama Parlamento ya Ukranyayê):

Em hem wekî partî û hem jî wekî hikûmet piştgiriya têkoşîna kurdan dikin. Lewre li Ukranyayê li dora 12 hezarî kurd hene. Ji ber vê hindê Kêşeya Kurd kêşeya Ukranyayê jî. Ji bo Öcalan gelê Ukranyayê li ser piyan e. Ger kurd bibin yek, tu kes û hêz nikare têkoşîna wan ya rewâ û mafdar rawestîne.

Duriye Awnî (Serokê Komîteya bo Öcalan Azadî ya Misirê):

Gelê Misirê Kêşeya Kurd wekî kêşeyeke cîhanê bi nav dike. Revandina Öcalan ji aliyê gelê Misirê ve bi awayekî xemgîn û daxbar tê şopandin.

Dr. Walter Baier (Serokê Partiya Komunist a Awûstûrîyayê):

Ji bo ku we destûra çavdêriya vê roja dîrokî da min, ez spasiya xwe pêşkeshî we dikim. Çawa ku doza mafên gelê Kosovayê tê kirin, divê doza mafên gelê Kurdistanê jî bê kirin. Li aliyê din tê gotin ku, wê Öcalan bi awayekî dadyane bê mehkemekirin, lê bi tenê wê kesen din û xînt bi vê yekê bawer bikin! Lewre helwesta Tirkîyeyê her kes pê dizane.

Lorgos Karabelias (Serokê Komîteya Hevgirtina bi Kurdan re ya Yewnenistanê):

Hikûmeta me jî bû destikê komployê û di girtina Öcalan de cih girt. Lî gelê yewnan, ji bo azadiya Öcalan rabû ser piyan û piştî 10 salan cara yekem 150 hezar mirov li hev civîya û doza azadiya Öcalan kir.

Miguel Labrador (Nûnerê Ewrûpâye yê Eniya Demokratik a Neteweyî ya Filîpînê):

Edî kes nikare mafê kurdan ji destê wan bigire. Heya iro gelek ciwanenê kurdistani xwe gorî vê têkoşînê kir, lewre kes nikare xwe li ber vê têkoşînê bigire.

Jose Mari Etxabarria (Nûnerê Partiya Neteweyî ya Baskê):

Ev doza me ye jî. Ji ber ku doza demokrasiyê ye. Rewşa Baskê jî wekî ya Kurdistanê ye. Lewre Bask jî ji aliyê Fransa û İspanyayê ve hatiye dabeşkirin. Ji ber vê hindê me bo gelê kurd bîrîvara piştgiriyeke timî girt.

Jon Rud (Parlementoya Norveçê):

Ger Kêşeya Kurd nayê çareserîrin, wekî ku li Kosovayê tê dîtin, mesele bi şîdetê naçin serî. Divê hûn guh bidin gotinê Ehmedê Xanî.

Diya min xezaleke çavşîn e

Qeramûşk

şevek xeniqok bi xumam
devgirêz
baraneke xûnavî hêmînî
lê xapînok
bajarekî serberdayî, lewre bajarekî feşkili
di mazûbaniyê de ye

kelogirî bûne sikak
dîwar
kelogirî ne taq
di rehîn min de digevize êş
qeramûşkan dide mêjiyê min
devgirêziya şevê
dikeve mazatekê xwîn
di pêşbaziyeke bêtixûb de
erzan
navran qetiyayî, bê ronî ezman
her stérkek bûye qijniyek bêtefsal
li canê min di mijandinekê de ye

pizikek bi elem e şev
bajar pengavek gemarî
di çavan de şan tarîfî
birîn di kewandineke xwêdayî de ye
û tenêtiyek bêderfet pişka min
berbang di pêwreke neçarî de ye

Îrfan Amîda

Lo bira tu guh nedî zimên

ziman bê hestî ye
dizivire bê destî ye
tu guh bide dil
dilê bi kul
dilê tenê û reben
xwezî zimanê dil hebûya
xwezî ew biaxiviya
tenê carekê
lê azad!

Harbi Soylu


Tol

Karxezala xem kişandin
kusiya xwe xemilandin
jiyan nema em rawestin
ji ber destê van neyaran
ji ber destê van xwînxwaran

dinya hemû li me har in
wekî gurê devkeyjal in
em mane bê dost û yar in
ji ber destê van neyaran
ji ber destê van xwînxwaran

em aştiyê pêşkêş dikan
gelan hemû yek dibînin
ew direvin, wek xenzir in
zeman xirab ji neyaran
zeman xirab ji xwînxwaran

ew bê soz in, bê peyman in
Welatê Rojê talan kirin



kes nebê ew însan in
ji ber destê van neyaran
ji ber destê van xwînxwaran

xwestin Rojê tarî bikin
çavê xwe wê birijînin
Şervanê kurd tolê hiltînin
ji neyaran, ji xwînxwaran

Abdurahim Demir

Diya min xezaleke çavşîn e

Lelê, ciya min i herêmî; hûn wê nanasîn
dibe ku jî hûn dinasin, dibe ku wê hûn jî anîne
ji ber ku diya min pirjimarî ye
ji çaxê Arî ye diya min
xezala çiyayê Pinyaniş
êgir bi avê venamîrîne
bi tenê ez dibînim ji zarokatiya xwe û vir ve
Zerdeşte ku di nava wê de diçirûse

diya min xezaleke çavşîn e
bi hezaran sal in diçe ber avê binefşî
lê didin nêçirvanê dîroknûs
û wê diyalektikê dinivîsin li çêrm:
Em hatin û çûn
Ew çerm li vê derê ye

Kawa Nemir

Di sermê de gerokekî efsûnan

berf û pûk
desten xwe di bêrikên xwe de
serê xwe di nav milên xwe de
vedişêrim
xwe diqurnisînim
bê serê xwe dimeşim
bi dilê te digerim
dilê min heye ku, cixarakê vexwim
qeşmerê bê nahêle ez vexwim

lê di dadanê de ji ba dijwartir derdikevîm
îcar dil dikim ku
di binya berfê de
straneke spî bêjim
lê li ser piştä quzulqurta cixara min
a ji muzîkê hez nake, kab nayê avêtin
guh nadim sermê
ji bo têxim nav tiliyêñ xwe cixarê
destekî xwe erzan difiroşim berfê
û li dûrî te
bi dengekî nîvî jê kuxik
straneke bi tîn û karîger li ser te û xwe dibêjim

tu
dixwazî ji te hez bikim
divê tu hez mekî ji min
ezê navê te bi kêrê li avê binivîsim

Rênas Jîyan

Bê lome be

erê derengiya qeseng
tu ci bibêjî, tu ci bikelimî erê
erê ji hemû nifirêñ giran re
min li ser serê xwe qebûl e
hemû terikandinê te

li ser van "ewrêñ destbixwîn"
ji şûre celadan re
dibin desmal bextewariyêñ min
çavşoriyêñ te ên bi çavresî
di noqa hêviyê min de cit bûne

li vî bajarî
ji mîrantiyê ketine sêwîtiyê min
nema li dawa evînêñ min dikevin mîza ewledan
û tu
li min û bavê min heram dibe li van deran
bê lome be

Emîn Bozan

Li Tîmora Rojhilat

Peyman hate girêdan lê êrîş naqedin



* BEŞA NÜÇEYÊN DERVE

Li Tîmora Rojhilat, di 5'ê gulanê de di navbera Endonezya û Portekîzê de, li ser Kêseya Tîmora Rojhilat peymanek hate girêjan. Neteweyen Yekbûyi NY jî wekî çavdîrê pêkanîna vê peymanê hate pejirandin. Li gorî vê peymanê, dê di 8'ê gelawejê de referandûmek were çekirin, heke gel bixwaze dê rîveberiya otonom pêk were, lê heke gelê Tîmora Rojhilat vê yekê nepejîrîne, dê serxwebûna Tîmora Rojhilat were rojevî. Lê rîexistinê kontrayî ji niha ve diyar kiriye ku, ew dê bi tu awayî serxwebûna Tîmora Rojhilat nepejîrînin û ji her alî ve êrîşî kesen serxwebûnxwaz dîkin. Tê gotin ku hin caran ew bi vê jî namînin, êrîşî otonomî-parêzen nerm ji dîkin. Li gorî agahîyen ku bi dest ketine, ji meha rîben-danê ku Serokê Endonezyayê B.J. Habibie mafê çarenûsiyê yê Tîmora Rojhilat aniye rojeve, heta niha zêdetirî 100 kesî bi destê alîgîrîn dewleta Endonezyayê hatine kuştin. Dê serdemâ propagandaya ji bo referandûmê di 20 tîrmehê de dest pê bike lê ji niha ve hinekan pankartên ku piştevaniya doza otonomiyê dîkin li bajarê Dîlî hatine daliqandine. Niha nûnerê NY'yê ku bi çavdîriya rewşa referandûmê hatiye peywirdarkirin, li aliye kî bi rîexistina siwanî ya komikên kontrayî FPDK'ê re hevdîtinan pêk tîne, da ku dawî li êrîşen xwe bînin. Li aliye din jî ew di de zanîn ku ewê van pankartan bide

berhevkirin. Sekreterê Giştî yê NY'ê Kofi Annan jî di civîneku ku roja 24'ê gulanê li New Yorkê pêk anî de, balîşand ser van êrîşan û sersariya

Artêsa Endonezyayê ya li hemberî van êrîşan rexne kir. Annan got: "Bi erebeyan, mirovîn bihevrebûnxwaz dikarin bi awayekî serbest li navçeyan cihîn kontrolê ava bikin û mirovan kontrol bikin. Kes ji artêş û polisan jî têkîlî wan nabe." Sekreterê Giştî yê NY'ê Kofi Annan diyar kir ku heke ewlehi pêk neyê, dibe ku referandûm bê taloqkirin.

Weki tê zanîn Endonezyayê di sala 1975'an de ew beşê rojhilat a Girava Timorê dagir kiribû. Ji wê demê ve berxwedan û serhildana 800 hezar kesen ku li Tîmora Rojhilat dijî, didome. Keskî ku ev 23 sal in di nava têkoşîna gelê Tîmora Rojhilat de cih digire jî, xwediyê xelata Nobelê Jose Ramos Horta ye. Horta di hevpeyvîneke bi rojnameya Irish Times re kiriye de, kîfxweşîya xwe ji bo pêkhatina vê peymanê tîne zimên. Horta, bawer e ku dê gelê Tîmora Rojhilat bi rîjeyeke ji sedi 90 serxwebûnê pesend bike. Niha Serokê Tevgîra Azadîxwaz a Tîmora Rojhilat Xanana Gusmao ji hêla dagirkiran ve bi hinceta xiyanetê bi 20 salan hatiye cezakirin û di mala xwe de girtî ye. Niha derdorê azadîxwaz dixwazin ku Gusmao serbest bê berdan, lê rayedarê Endonezyayê dibêjin, ew ji bo ewlehiya canê wî Gusmao bernadin û ew dê piştî referandûm wî serbest berdin. Lê Horta vê hinceta rejîma Endonezyayê wekî tiştekî komîk dibîne û dixwaze ku ew,

di zûtirîn katê de serbest bê berdan. Horta dibêje heke Gusmao serbest neyê berdan, ew dê referandûmê boy-kot bikin.

Li Endonezyayê jî amadekariya hilbijartina giştî tê kirin. Di 7 pûşperê de dê hilbijartin pêk were. Niha wekî kesê herî zêde nêzî serkeftinê serokê niha û berendamê partiya desthilatdar Partiya Golkarê Habibie heye, lewre tê gotin ku artêş li pişt wî ye. Li hemberî wî Xanim Megawati Sukarnoputri heye. Sukarnoputri keça serokê ku bi derbeyeke leşkerî ji ser kar hate dûrxistin e.

Endonezya ji sala 1965'an vir de ji hêla diktator Suharto ve hate bi rîvebirin. Amerika vî welaflî wekî heval-bendekî stratejîk dibîne, ji bo parastîna berjewendiyê wê yên li herêmê û ji bo bisînorkirina hêza Çinê li herêmê. Li vî welaflî hêz di destê artêşê de ye, lê piştî sala çûyî Suharto, ji ber serhildaneke girseyî bêgav ma û dev ji serokatiye berda, Habibie hate ser kar û mafê çarenûsiyê yê Tîmora Rojhilat anî rojevî.

Li ser sedema vê yekê Serokê Endonezyayê Habibie dibêje: "EZ fikirîm, min got em li vê cihenema Tîmora Rojhilat ci dîkin? Jixwe di nava sînorîn me yên neteweyî de jî cih nagîre". Horta di wê baweriyê de ye ku sedema bingehîn a guherîna helwesta Endonezyayê amborgaya li ser wê û qeyrana aborî ye. Di vê qeyranê de jî balê dikişîne ser rola IMF'ê û lewre jî bi awayekî henekî dibêje: "Dema me serxwebûna xwe bi dest xist, em dê navê Serokê IMF bidin kolanekê."

DI ÇAPEMENIYA CÎHANÊ DE KURD

Enqereyê dîsa kurd wekî 'tirkîn çiyayî' bi nav kirin

✓ Rojnameya Die Welt, di nûçeyeke xwe ya roja 25'ê gulanê de cih daye bir-yara Wezîrê Karê Hundîrîn ê Tîrkiyeyê ya li ser qedexekirina hinek peyvîn têkildarî kurdan. Di nûçeyê de hatiye gotin ku, dewleta tîrk ji mîj ve kurdêni di nava sînorîn dewleta xwe de, wekî netewe napejirîne û wan wekî 'tirkîn çiyayî', hemwelatiyê rojhilatî bi nav dike. Li gorî nûçeyê, ev helwesta tund a li hemberî kurdan û zimanê wan, di dema Turgut Özal de hinekî sist büye, lê vê sistiyê zêde dom nekiriye. Di nûçeyê de qedexeya li ser perwerdehiya bi kurdî û weşana radyo û televîzyona bi zimanê kurdî ji hatiye zimên. Nûçeyê bi bîr xistiye ku di bîryarê de ji bo serokê rîexistinê Başûr jî peyva "serokeşîr" guncaw hatiye dîtin.

Konseya Ewrûpayê delegasyonekî dişîne doza Öcalan

✓ Ajansa Reutersê roja 26'ê gulanê nûçeyek li ser doza Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ragihandiye aboneyen xwe. Di nûçeyê de hatiye gotin ku, dê Konseya Ewrûpayê nûnerên xwe bişîne dozê. Li gorî nûçeyê Konseya Ewrûpayê li ser vê mijarê daxuyaniyek belav kiriye û tê de gotiye ku Tîrkiyeyê destûr daye ku nûnerên Konseya Ewrûpayê wekî şexs, beşdarî Doza Öcalan bibin. Di nûçeyê de hatiye diyarkirin ku Konseya Ewrûpayê dozê ji nêzîk ve raçav dike, da ku mercen darizandineke dadyane pêk were. Her wiha hatiye daxuyandin ku konsey, li dijî cezayê daleqandinê derdikeye. Di nûçeyê de gotinê hinek endamên konseyê yên bi rengê "heke Tîrkiye cezayê daleqandinê bide Öcalan, dê ji endamtiya Konseya Ewrûpa bê avêtin" jî cih girtiye.

Ji Kurdistanê ta Marmarayê Öcalan

✓ Rojnameya Erebistana Suûdî Okaz, di hejmara xwe ya roja 21'ê gulanê de cih daye nûçeyeke li ser Kêseya Kurd û tevgîra İslâmî. Di vê nîvîsa ku ji hêla Kamil Hazer ve hatiye nîvîsandin de, hatiye diyarkirin ku laîsîzma kemalîst nikare bersiva kîşeyen Tîrkiyeyê bide. Di nûçeyê de hatiye daxuyandin ku Tîrkiye bi doza Öcalan hatiye buhureke geleki teng û heke dev ji kemalîzmî bernede, dê gelekî tengav bibe. Di nûçeyê de çareseriya İslâmî bo Kêseya Kurd hatiye pêşniyazkirin û hatiye idiakirin ku Öcalan jî piştevaniya çareseriyeke bi vî rengî dike. Her wiha hatiye gotin ku Kêseya Kurd di çarçoweya biratiya olî de dikare bê safikirin û ew çareserî dê gelên Rojhilat Navîn di bin ala İslâmî de bigîhîne hev.

Ciroka xwedyê şûrê giran,

Hemzeyê Pêlewan

Hecî Hemzeyê Pêlewan bû, xwendiyê şûrê giran bû. Hemzeyê Pêlewan heta bivê, mîrekî bi bejn û bal û mîrekî cengawer bû. Ne şûrê tu kesî wekî yê wî xweşik bû, ne jî giran bû. Dema ku Hemze çûbû nêçirê, ci seval ji ber rabûya, felek jî bavê wê bûya, ji ber Hemze felata wê nebû. Porekî reş li ser Hemze bû. Porê xwe bi paş de dişekinând, çavên wî yên reş û belek di bin herdu birûyên reş û stûr de di dibirişin. Aniya wî wekî heyva geş spî dikir. Jixwe dema ku ew simbelén reş badidan a xalîqa te got qey mîr li darê dinê hebe hebe Hemzeyê Pêlewan e.

Hemzeyê Pêlewan ku ne şal û şapikên Şîrnexî bûna, tu cil li xwe nedikirin. Temenê Hemze gîhabû cil salî, lê hê ew nezewicibû. Bi serê hemû şêx û mişayixê welatê Bota sond xwaribû ku bi tu keçê şîrê mirovan mêtî re nezewice. Hevalekî Hemze hebû. Hevalê Hemze jê pîrs kir: "Ya Hemze tu ew qasî mîrekî bi bejn û balî û bejn û bala te li hevhatî, tu hew qasî cengawer, çima tu nazewicî?" Hemze dibêje: "Ya kekê min i hêja û delal, tu jî zanî, heçû mirov in şîrê xav mêtîne. Ji ber vê yekê baweriya min bi keçen şîrê xav mêtî nayê".

Wê gavê Hemzeyê Pêlewan û hevalê wî Tajdîn, li ber tavkê rûniştibûn. Xezalek li hewşa Tajdîn ji xwe re diçêri. Hemze; 'Ya kekê Tajdîn niha ev xezal li hewşa te ci dike? Ka işev bi gûrêne, em ji mêt ve neçûne nêçirê, me bêriya goşte xezalan kiriye.'

- Kekê Hemze heçî tu wî, tu ji min darê dinê ci bixwazî ez nabejim na, lê heçî ev xezala hanê ye, wê dayiktî ji keça min re kiriye. Dema ku keça min hate dinê, ji dermana re jî, şîr li diya wê nebû. Vêca vê xezalê keça min bi şîrê xwe xwendî kiriye. Ez dê çawa wê bigurênim?

- Kekê Tajdîn, a te got li ser serê min û çavê min, lê ez li ezmana keçekte wekî ya te digeriyam, va ye min li erdê dit. De ka bêje kekê Tajdîn, tu ji vê gotina min re ci dibêjî?

- Vêca kekê Hemze ev jî ne ya gotinê bû?

Ez bi serê Xanî Baba sond dixwim ne keçek, tu bêjî heft kuran ji min re bigurêne; ezê bigurênim. Bila ya tu bixwazî keçek be.

Heçî keça Tajdîn bû, ji birêketina xwe û heta dozdeh saliya xwe qevzek pişt derê hewşa xêni neavétibû, her û her an di xêni de bû, an jî di hewşê de ji xwe re dileyist. Hemzeyê Pêlewan rabû ew keçika dozdeh salî û qet dinya nedîfî, li xwe mahkir. Navê keçikê Xecê bû. Hemzeyê Pêlewan bi her du çepilê Xecê girt û danî ser

pişta hespê xwe yê rewan. Cû xatir ji hevalê xwe yê dilsoz Tajdîn xwest û li hespê xwe siwar bû. Şivek li kemaxa hespê xwe da û hespê wî bi çargavkî berê xwe da çiya. Çiyano hûn ci çiya ne? Palawan li hev e. Tu dibêjî qey ser û binê van çiyayan nîn e. Li milekî Çiyayê Cûdî bi hemû bilindahiya xwe û xweşikbûna xwe her û her li Silopî û li Cizîra Botan dimeyzene, li milê din Çiyayê Dêra, Çiyayê Gabarê û Çiyayê Bizêna hene, çiya ji dar û deviyan ji daristanan bihara kesk dikin, li van çiyayan tu ji dilê xwe re li ci dar û tebayî bigerî tuyê bibînî. Te guwîz bivê, hejîr, tiryîê teywî, zeytûn, sêv, berû, guhîj, inab, kezwan; ma ci û ne ci heta te bivê, dar û team di van çiyayan de hene. Hemzeyê Pêlewan cû cû di nav wan çiyayan de rawestiya. Rabû ji dest û dilê xwe re quesrek çêkir. Hemze her roj diçû nêçirê. Carinan Xezal dikuştin, carinan ji kew. Ci biketa ber, lê nedibihurî. Wê êvaran tifaqa êgir tijî qurmên berûyan kiribana û goşte xezal û kewan qulubandibana vî aliyî û aliyê din. Heta ku goşte wan sor bibûya, vêca wê goşte xwe bixwarana û dest kîf û henekên xwe bikiran. Hemzeyê Pêlewan hingî ji pîreka xwe hez dikir. Li ku dera herêma Botan piçek hine hebûya, wê biçûya bianiya, di porê pîreka xwe bida. Dîsa rojekê Hemzeyê Pêlewan diçe nêçirê, pîreka wî Xecê jî xwe di Çiyayê Bûnisra de berda hate ser Borê Zêwê. Borê Zêwê ji nav dilê Çiyayê Botanê diherike, di çiyayan de her û her bi gumîn û xuşîn diherike û li himber Bafê tevlî Çemê Dîcle dibe. Xecê kinc û qepalê xwe şûştin û danê tavikê, kinc û qepalê wê ziwa bûn. Paşê rabû destmala li ser serê xwe danî erdê û hinek av bi xwe de kir. Sabûna kizwana bi porê xwe ve bir û anî, bir û anî heta porê wê baş kef da. Rahîste şehê xwe û hêdî hêdî porê xwe şekinand. Çika ku şeh diavêt serê xwe, müyê porê wê dihatin xwarê. Pene ya xalîqo tu li porê Xecê dinêri, tu dibêjî qey ji têla qeseb e. Poreke sohr û zereve, li ser serê Xecê hebû. Ew porê Xecê yê weşiyayî biber ava Borê Zewê ket û heta giha Çemê Dîcle. Çemê Dîcle ew por li ber xwe bir û bir heta gîhande Cizîra Botan. Heçî kurê mîrê Cizîra Botan bû, xortekî heta te bivê bi bejn û bal bû. Kurê mîr ji rojekê ji rojan çûbû ber Çemê Dîcle. Navê kurê mîr, Şero bû. Şero lingên xwe rût kiribûn, berdabûn nav ava çem. Şero halo meyizand ku tiştekî sor û zereve li piyên wî hebilî. Ji xwe re got 'a xalîqo ev ci ye?' Şero rahîste porê Xecê û saetekê lê meyizand tiştek jê fêm nekir. Şero rabû ew çend müyên porê Xecê xistin bêrika xwe û li hespê xwe siwar bû û bi çargav-



kî hespê xwe ber bi Birca Belek ve da bazdan. Şero ji hespê peya bû û bi lez cû cem diya xwe got: 'Dayê dayê de ka meyzene ev tişte hanê iro min ji çem derxist, ka were lê meyzîne ev ci tiş e?' Dayîk bi qurban te ci dîtiye?' Diya Şero li por meyizand meyizand, gote 'kurê min bi cidê bavê te kim, ev ji porê pîrekekê pê ve ne tiştek e.' Şero got: 'Yadê! Xwediyê vî porî li ku derê be divê ez wê ji xwe re bînim.

- Ohhhh kurê min kîm zane, xwediyê vî porî li kîjan gund û bajarê Kurdistanê dijî.

- 'Naaa bi erd û ezman sond dixwim, heta ez wê keçikê nebînim wê nekim pîreka xwe, tebat li canê min nakeve.' Şero rabû bang kir daholvanekî, gote 'tê heta êvarî bang hildêrî û tê bêjî ci zanyar û sêhrebend di nava Cizîra Botan de hebin, bila werin koşka mala mîr.' Di nava kolan û kuçeyen Cizîra Botan de bû dingdinga daholê. Dengê daholê li çiya diket û careke din li Cizîre vedigeriya. Daholvan dengê xwe berda û hey berda: 'Hey hêê kurê mîrê me emir daye, gotiye heçî zane û sêhrebend be, bila were koçka me. Heçî kesê here ew dê were xelatkirin.' Li nava Cizîra Botan ci zanyar û sêhrebendê heye, li mala mîr kom bûn. Hemûcikan yekoo yeko li porê Xecê meyizand lê ji xeynî pîreke sêhrebend, tu kesî ew por nas nekir. Şero got: 'Pîre ev por porê kî ye û ji ku hatiye?'

- Hûûû kurkê min, wele weke ku dibêjin xwediyê vî porî di nava çiyayê Botanê de dijî. Pîrek xwedî mîr e û weke ku dibêjin pîreka Hemzeyê Pêlewan e.

Şero got: 'Pîre ez nizanim, ew pîreka dêwê heftserî jî be, divê tu herî wê ji min re bînim.'

Pîre got: 'Kurkê min welehî ya tê dila, hemû cara neyê mila. Lî ezê xwe biceri-

bînim. Heke min xapand, ji stûyê min weke müyê li ber şûrê te zirav e.' Pîre rabû daw û delingên xwe hildan, kopale xwe kire destê xwe û berê xwe da çiya. Pîre ji pira Cizîre derbas bû û ber bi çem û berçem hêdî hêdî, bi rê de cû. Pîre ji Ava Rûsor derbas bû û di wir re cû ber ava Borê Zêwê. Vê carê pîre kete ber Borê Zêwê û bi çiyê ve hilkişa. Pîre hilkişa û hey hilkişa, heta giha serê Çiyayê Bûnisra. Pîre li serê çiyê rûnişt û bêhneke kûr kişand. Pîre westiyabû. Ji xwe re got li min totakê ci karê min li serê van çiyayan hebû. Vê carê ji gotinê ku kurê mîr jê re got, hatin bîra wê û got ma karê sêhrebenda ci ye? An fesadî ye, an ji derxistina ser û pevçûna ye. Pîre rabû ser xwe û halo li dor aliyen xwe meyizand û disa ji xwe re minminî. Ya xalîqo te çiqasî dinya xweşik afirandiye. Çemê Dîcle weke marekî kesk kesk e, stû û dirêj xuya dikir. Pîre hêdî hêdî cû ber deriyê qesra Hemzeyê Pêlewan rawestiya, Xecê ji li ser banê qesrê ji xwe re li deverên çiyayê Botanê dimeyizand. Xecê halo meyizand ku pîreke li devê hewşa qesra wan rawestiyye. Xecê got; 'Pîrkê te xêr e, qey te riya xwe winda kiriye, ci ye?'

- Erê keçkoka min, bi serê te yê ezîz kim, min riya xwe winda kiriye. Ez û hevalê xwe, em dê çûbûna hecê lê wan ez li paş hiştîm û ji ber vê yekê min riya xwe xelitand. Ez li rasta te hatim. Xecê ku tu mîvanê Xwedê bihewînî, ez dixwazim çend rojan bîmînî li mala we.

- Pîrkê de ka tu li wir rûne, heta mîr min were, ezê jê pirs bikim ku mîvanda-riya te pejirand, li ser serê min û bavê min bibe mîvan.

(Dê bidome)

HERÊM: BOTAN

BERHEVKAR: EMER VESEK

Gula Sor li bakur jî bişkivî!

Kaseta Ciwan Haco ya bi navê "Gula Sor" ku berê Ewrûpayê hatibû tomarkirin belavkirin û bi awayekî koranî ketibû mala gelek miyôvîn ji bakurê Kurdistanê, ji şela firmaya Ses ve li Tirkî eyê hate tomarkirin û kete pazara kurdên bakurê Kurdistanê. Helbesta ku navê xwe daye vê xebatê, ji hêla Qedrîan ve hatiye nivîsandin û gekekî navdar e. Mirov dikare vê helbestê wekî helbesta pêşin a kurdî ya ku bi şewaza serbest hatiye ristin, bi nav bike. Di helbestê de hêmâyên xurt hene innewaya wê jî xweş lê tê.

Gelek stranê di vê kasetê li nav ciwanê kurd belavîne û ji hêla wan ve hatine ji-erkirin. Digel stranê gelêrî ên mîna "Bêrîvanê", "Lê Jinê", stranê di çêja stranê gelêrî de ku ji hêla hunermend i xwe ve hatiye afirandin ji hene. Di i warî de mînaka herî darî çavan, strana bi navê "Yêrîvan" e. Her wiha li kasetê de hinek helbesten Cigerxvin ên mîna "Pir xweş e" û "Hevala vîndar" ji hatine binewakirin û wekî stran hatine pêşkêskirin. Tomarkirina berhemên wiha ku êdî di civaka kurd nemaze ciwanê kurd, de wekî klasik

Ciwan Haco



gula sor

2
FARS

têne dîtin mirovan kêfxweş dike. Lî divê qelîteya deng a kasetan hê jî baştir be. Di berga kasetê de cihdayina gotinê stranan di warê pêşketina xwendina kurdî de gaveke erêni ye. Dîsa helwesta ku jînenîgariya Ciwan Haco bi kurdî û îngilizî daye jî şayanî pesnê ye.

SERWÎSA ÇANDÊ

Biratiya gelan

OSMAN ÖZÇELİK

Jî kesen ji dê û bavekî re, dibêjin bira. Li gorî cînsiyetê xwişk (xwang, xweh) û bira jî ji dê û bavekî ne.

Jî biratî, xwişktî, xwişktî û beratiyê xweştir tu tişt nîn e. Di rojêng teng de, di şahîyan de; hebûn û tunebûn, kul û elem bi hev û din re têne parkirin. Bira, xwişk, xwişk û bira ji hev û dun re pişt in. Bê ku cudafi di navberê de hebe, zarok jî ji dê bavan re kezeb in.


Biratî û xwişktî çicas şerîn be jî, gava mîratê berjewendiyê kesayetiye derdi Kevin holê, bira bira nas nake. Dîroka mirovatiyê bi şerîn bira dagirî ne. Carinan şer li ser gepek nan, an jî li ser kevçiyekî şorbe derdi keve. Carinan bihustek erd an darek bejî, dibe sedema pevçûn û kuştinê. Di şerîn text û taca hikumdarîye de xwîn diherike û bi salan dewam dike.

Gava li ser bingeha neheqiyê mîzîna wekhevîyê xera dibe, tu kes nikare pêşîya pevçûn, dijûn, şer û lêdanê bigire. Ji biran yek neheqiyê qebûl bike jî jînbira kirâsê xwe diçirîne. Şerîn bira, bi piranî bi jîmalderketina

Hejmara biharê ya Bîrnebûnê derket

Kovara kurdên Anatoliya Navîn Bîrnebûn, a werza biharê bi nivîsên tirkî û kurdî derket. Hemû nivîsên di kovarê de li ser çand, ziman û dîroka kurdên Anatoliya Navîn in. Di pêseka kovarê de pêşî li ser na-veroka kovarê agahî têن dayin û piştre jî li ser dîlketina Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan tê rawestandin. Li ser vê bûyerê hatiye gotin ku gelê kurd yekîtî û helwesta xwe ya li dijî vê bûyerê nîşan daye û ewê teqezi bi ser bikeve. Nivîsa yekemîn li ser helbesten Osman Alabay e ku bi navê Curukî navû-deng daye. Di vê nivîsa ku ji hêla Dr. Mikail ve hatiye amadekirin de li ser têkoşîn û helbestvaniya Curukî hatiye rawestandin û hinêk mînak ji helbesten wî hatine pêşkêskirin. Ji helbesten wî yên ku bi şewaz û zimanê gelêrî hatine rîstîn de, evîna welêt û doza neteweyî diffire.

Nivîsa duyemîn bi tirkî ye û ji hêla lêkô-lîner Mehmet Bayrak ve hatiye nivîsandin. Bayrak di nivîsa xwe ya bi navê "Binboğalar'da Kürt Şarkıları (Binboxayan stranê kurdî)" de li ser çanda kurdî û dîroka pişafatînê agahiyêñ balkêş dide. Di dawîya nivîsê de ji stranê kurdên Anatoliyê çend mînak ji hatîne pêşkêskirin. Nivîseke balkêş a vê hejmarê jî, nivîsa li ser kurdên dimil ên li Aksarayê ye. Di vê nivîsê de li ser zaravayê dimîlî yê



ku gelê herêmê pê dipeyive jî agahî hatine dayin û çirokeke gelêrî jî hatiye derpêskirin.

Ji bilî van nivîsan gelek nivîsên çandî- lêkô-lînî û hevpeyvînên bi kesen cur bi cur re hatiye kirin di nava rûpelên kovarê de balê dikişin ser xwe. Ev kovar ji bo mirovîn ku dixwazin kurdên Anatoliyê û çanda wan binasîn geleki pêwîst e, lê mixabin ji ber ku kovar li Swêdê tê weşandin, bidestixtina wê nehêsan e. Divê berpirsên kovarê têkiliyên xwe di vî warî de xurtir bikin û zêdetir gîrañîyê bidin belavkirin û nasandina kovarê.

SERWÎSA ÇANDÊ

birayêbicûk diqede.

Bi sosyalîzmê re bêjeya "Biratiya Gelan" kete lîteratûra siyasi. Li gorî sosyalîzmê, şerê gelan şerî berjewendiyê serdestan e. Serdest feodal in û pergala wan împaratorî ye. An jî serdest birjûwa ne, sazûmana wan jî dewleta neteweyî ye. Serdest ji bo berjewendiyê xwe yên aborî şer derdixin û gelan diajon qada şer. Di encama şer de yên wîndâ dikin, gel in û yên bi ser dikevin jî serdest in. Ew e ku şer ji gelan re tu karê nayne, naxwe divê gel bi hev û din re şer nekin. Divê gel tenê bi serdestan re şer bikin. Vê dîtinê diruşmeyen "Hemû gel bira ne" û "Bijî biratiya gelan" afirandine.

Dîtinên olî jî li ser bingeha yek-olî, biratiya gelan anye holê. Hemû îslâm bira ne, hemû xiristiyan bira ne hatiye gotin.

Genêli çand û zimanê xwe; bi dîrok û coxrafaya xwe nêzî hev û din bin, xwe mîna 'gelên bira' dihesibînin.


Genêli ku berjewendiyê wan bi hev û din re bin, an di réxistin û sazûmaneke aborî, siyasi, an leşkerî de hatibin ba hev û din, xwe mîna bira bi nav dikin. Bi xwezayî li ser navê gelan, dewlet û réxistinê dewletê vê propagandayê dikin û gel wiha motîve dibin.

Gelo birayên gelê kurd kî ne? Em dikarin ji kîjan gelî re bêjîn bira?

Di her civîn û mitîngîn xwe de, bi dengeki berz heta ku kezeba me diçire, em slogan "Bijî biratiya gelan" davêjin. Pişik li me reş bû, belê qet bersiv nehat. Çima? Divê em kumê

xwe deynin ber xwe. Divê em biratiya xwe li hindek pîvana bixin. Carekê em ne ji dê û bavekî ne. Ew tûranî ne, em arî ne. Zimanê wan Ural-Altayî, yê me Hind-Ewrûpî ye. Ola wan a kevn Şamanî, ya me Zerdeşî ye. Ola nû jî em nekirine yek. Ew Hanefî-Bektaşî, em Şâfi-Elewîne. Coxrafaya wan a kevn Asyaya Navîn, a me ya nû û kevn Mezopotamyaya Jorîn e. Pêşî û paşıya wan şerûd û şerxwaz û yên me dilbirehm û aştîxwaz in. Ew serdest û xwedî mal, em bindest û malwêran in. Sedem ev e ku bersiv nayê.

Em xwe dixapînîn, em dilê xwe xweş dikin û dibêjin, "ci hatiye serê me, dewletê anîye." Em dibêjin, "gel ne sûcdar e." Belê em dizanîn gel ci be, dewleta wî jî ew e. Ku gel ji kîrinê dewletê ne razî bûya, qey wê wisa bûya, di hilbijartınan de wê dengen xwe bidana partîyen nîjadperest. Ew partîyen ku ji me re dibêjin: "An hez bike an biterikîne" ku ne wilo bûya, aqilmendê partiya ku ji xwe re dibêje 'sosyalîst', digot: "Me hilbijartın ji sedema nêzîk bûna kurdan winda kir. Ger wiha bûya, partiya ku jê re dibêjin 'şerîetxwaz', gazin dikir ku dewlet wan û siyasetmedarîn kurdan dike yek. Ew xwe mîna birayên me nabîn û ne şert e ku em zorê bidin wan û wan aciz bikin. Em tenê cîran in. Divê em ji bo cîrantîyeke birûmet, ji bo cîrantîyeke mirovî hewl birîn. Cîran jî dikarin ji hev û din hez bikin û di nava aştiyê de bijîn.



Ji xwendevanekî me yê xerîbiyê çend pêkenok

Balinde

Du faşist di rê de diçin. Balindegék di ser wan re derbas dibe û bi ser serê ye-kî ji wan de dirit. Yê din ji hevalê xwe re dibêje:

- Bilezîne, hinek av bîne da ku ez bisom.

- Eeh, ehhh, fîyde nake, balinde çû jî.

Rewşa du girtiyân

Du girtiyên tirk her êvar nifteyên girtigehê didizin, derî vedikin, û bi şev diçin ji xwe re digerin û beyaniyê (serê sibeyê) vedigerin girtigehê. Lê êvarekê, yek ji wan, ji yê din re dibêje:

- Tu dizanî, bi Xwedê işev em nikarin biçin gera xwe!

- Çima?

- Tu dibînî, iro dergehvanan ji bîr kiriye ku derî bigire!


Hûn hemû serxwes in

Mirovek li meyxaneyekê ye û ji yekî dipirse:

- Tu dikarî, ji kerema xwe re, bibêjî ka saet çende?

- Diwanzdeh kêm pênc deqîqe ye.

- Eeh, dixuye ku hûn hemû serxwes in. Vaye ji êvarê heta niha min sê caran saet pîrsî û carekê jî bersiv ne mîna cara din e!



Tirkek li muzeyê

Li muzeyekê tirkek rîber e. Mêvan têwir û ew jî dest bi danasina dînazoran dike:

- Komhestiyê vî tîranozor rexî 80 mîlyon û 12 salan kevn in.

Ji mêvanan hinek heyirî dimînin ku cawa bi dîroka dînazoran dizane û yekî ji wan dipirse:

- Cawa, tu dîroka dînazoran dizanî?

- Belê, belê cawa ez nizanim. Dema ku ez hatim vir, ji min re hat gotin ku ev tîranozor (dixwaze bibêje dînazor) 80

mîlyon salî ye. Ü va ye ez 12 sal in jî, li vir im. Anglo 80 mîlyon û 12 salî ye!

Rêwîtiya bi trênenê

Zilamek bi trênenê diçe mala hevalê xwe. Di mala hevalê xwe de ji hevalê xwe re wiha dibêje:

- Di trênenê de çavên min zivirîn û serê min eşiya.

- Çima? Ma dengê trênenê nexwes bû?

- Na, lê pişta min ketibû aliyê cûnê.

- Ma tu kesî nehişt ku tu cihê xwe pêre biguherînî?

- Çawan minê bikariya biguheranda.

Di vagonê di ji bilî min kesekî din tune bû.

Nizane mirî ye, yan sax!

Hevalekî du kesen tirk dimire. Her du li ser dipeyivin:

- Tu dizanî gelo dema ew mir, razayî bû?

- Sed heyf û mixabin ku ew heta niha jî nizane ka mirî ye, yan sax e!

Tor çi ye?

Yek ji yekî din dipirse: "Tor çi ye?"

Yê din bersivê didê: "Komek nanênu ku bi hev ve bi bendan hatine girêdan e."

Li hewa biçûk dîbin

Du tirk li balafirgehê ne, yek ji yê din dipirse:

- Ez qet fêm nakim ka çawan ev balafirêne ewqas giran û mezin, dikarin li hewa bifirin.

- Ew tiştek pir basit e. Li hewa ew pir piçûk dîbin!

Patat

Mirovek dixwaze petatan bikire. Ji petatfîros re dibêje:

- Pênc kîlo petat bide min lê bira ne yên mezin bin, ji ber ku ez nikarim tiş-tên giran hilgirim.

H.M.ZAXOYI

BI XELAT...

XACEPIRSA BI XELAT (174)

XACEPIRSA

Bersiva Xacepirsa 172'an

Xacepirsa me bi xelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv
bigihêjin ber destê me, em dê
wan binirxînîn û bi riya pêskê li
5 kesan belav bikin. Xelata hej-
mara me ya 174'an Kaseta
Mihemed Şêxo 'Dil Perîşanî'
e

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxan-
din, divê hûn "Peyva Veşarı"
di nava qutiyêni li bin xace-
pirse de binivîsin û tevî navnî-
şana xwe ji me re bişînin.

mihemed şêxo
Dil Perîşanî

4

MEM KAYA

BÊJING



MRALÎ RA XEBER ESTA

bûkatê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî Mahmut Şakar:

Qeraro serniyê dewlet de bidiyo

MEMED DREWS

(e.mail:mehmet@welat.com)

Deynî de hefteyo peyin ame. Panj rojî mend. Rojê panjin rojê mehkemaya seser o. Ta-her çiqas mayê wina nûsemi jî, bo ke rojê mehkema taloq bo Vatenanê serdanê dewlet ra taloq yayanî mehkemayo ayseno. Çike e wazenê verê mehkema qanûnê GM bivurnê, bado Öcalanî vejê mehkema ver.

Na mesel ser, ma 25'ê menga 1999 de abûkatanê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî ra almut Şakarî ya qisey kerd. Go-ye vatena Şakarî dewleta wazena mehkema taloq bikiro. Bado Öcalanî vejo mehkema ver.

Abûkat Şakarî sebebê taloq astena dewlet jî wina ard ziwan: "Ke yeno zanayin Mehkemaya Mardimanê Ewropa (HME) qerar da û vat; 'qerarê GM hiqûqî niyê, çike heyeta mehkemaya miyan de esker esto, es-ker jî xoser nêbenê girêdayîyê hî-terşîyê eskerî benê'. Coka HME' ya qeraranê DGM zey qeranê hiqûqî nêhesibnena. Qandê qerarê Mehkemaya Ewropa, dewleta rind zana, qeraro ke DGM'ya ewroyin de derheqê Öcalanî de vejiyo, bê ci keso ê qerarî hiqûqî mesibô.

Ninana piya jî dewleta zana, eke eyê hiqûqê zerî ke, biqediyê mayêawa bemi Mehkemaya Haqê Mar-

dimanê Ewropa û aya wija mehke-ma vîni bikiro. Coka jî aya wazena, verê na ray nika rabibirno. Qandê verniya na ray birnayin jî, lazimo ke qanûn bivuryo. Feqet ma abû-katê Öcalanî rind zanê ke, qanûnê DGM bivuryo jî, mevuryo jî, qeraro eynî qerar bo. Bewn mehkema rê çehar panj rojî mend, dewle-ta nêviradena ma Öcalanî ya rehet pêdiyin virazim. Hefte de, bê di rojan mayê nêsemi Öcalanî ya pêdiyin virazim. Ancî aya nêviradena ma belgeyekê bidim Öcalanî. Oyo mi rê winî ayseno ke, jew nameyê mehkemayo mehkema bo. Qeraro ke wija bidiyo jî oyo "serniyê dewlet de bidiyo" feqet, ê qerarı heyeta mehkemaya eşkera bikiro."

Abûkat Mahmut Şakarî vat ke, eke dewlet mehkema taloq bikiro jî, aya 31'ê meng de bikiro. Yanê 31'ê meng de Girawê imralî de mehkemaya viraziyo, aya vernî de meseleya taloqkerdin ser ro vindiro. Taloq kerd kerd, eke mekiro a-ya hetanî qedyayina mehkema bêmaben dewam bikiro. Goreyê taxmînê Şakarî mehkemaya nez-diyê di mengî biramo.

Abûkat Şakarî vat ke, Öcalanî xo qandê rojê menkema kerdo hedire. Oyo nika 31'ê meng paweno. Öcalanî parastinê xo dayo ïnan û iyê nika parastina Öcalanî ser ro vindinen. Goreyê vatena abûkatê Öcalan Şakarî, Öcalano wazeno mehkema açarno platformê aştî û demokrasî. Coka Öcalano qe idâ-

namey ser ro mevindiro, oyo im-kanê piya mendin biyaro ziwan, a-bûkatê jî idanamey ser ro vindirê.


Abûkat Şakarî peyniya mehke-ma ser ro jî wina vat: "Hetanî na seat tevayo zelal nêvînyeno (nêay-seno). Heme çiyo zey awa lêl ma-neno. Her çiqas mayê vêşî îhtimal nêdam jî, wazemi ke, mehkema ra winî jew qerar vejiyo ke şarê kurd û tirk dişmenê pê mekiro".

Abûkat Şakarî da zanayin ke, Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalano roj, yan jî rojanê mehkema qandê çareserkerdina meseleya kurd zey firsendo gird vîneno û o-yo wazeno na mehkema bibo plat-formê çareserkerdina meseleya kurd û demokratbiyina dewleta tirk. Ancî goreyê vatena ey, Öcalanî vato ke: "Ezo qandê meseleya kurd raya aştî û demokrasiya çareserkerdin bixeftiyî û min dest ra çi-çi bêro ezo bikirî, feqet dewlet ke gam meçekiro wa her kes rind bi-zano ciyê ke, ez jî meşrî verê ci bigirî vejiyenê werte, o çax jî her ke-so nê rojan geyrenê. Na wastena ma niya. Wa dewlet rind bifikiryo û winî gama xo çekiro."

Oyo winî ayseno ke menga puş-para menga dîrokî bo. Wastena ma jî a ya ke, hetê rindîna şarana men-ga dîrokî bo.

Rojevê de
tê miyan
de

LERZAN JANDÎL



R ojevê henî rew vurîna ke, mordemê ke her roj nivisnenê jî nêşîkînê biresê na rojevê. Kesêke zê mi pancês roja de, rête nivisnene na derheq de tayîna zaf tengasiyan ancenê. La belê nê nivisê xo de, ez wazena hîrê temayan ser ro zaf kilm vinderî.

1-Kemal Paşa seke dersena dîroka resmiye de amê idia kerdene û ere ma mektebanê koledaran de amê musayîme, seba hîlaftî werdardayene, welat û şarî rax-elesnayene, demokrazi û laîklîgiye ardene û Tirkiyeyê de modern û demokratîke ardenê nêşî Samsun.

O, yanê müfetîşî leşkeriya 9. Mîrlîva Kemal Paşa, sere de seba pêguretena Topal Osman û çeteyê bînê ke hemverê xiristiyanan sûc kenê û ebi idam ênê cêrayene, hetê paşayê Osmaniyan teba 21 hevalanê dê amê ruşnayene. Armancê Paşayê Osmaniyan rûman û ermeniyan çeteyane tîrkan ra pareznayene biye.

Kemal Paşa ke ebi nê karî şono Samsun roja 29.5.1919 de Havza de Topal Osmanke ganî pê-bicero, yew diyene virazeno. Naye ra dime dîroka ma û şarî Tirkîye rind êno zanayene.

Seke sarewederdayena Naziyan, têkoşîna azadiye niya, sarewedeardayena K. Paşa û generalenê osmaniyanê bînan jî, raxelesnayena şarî niya. Na ganî rind bêro zanayene. Seba naye ra ewro dewleta Tirkîye pêlanê şovenîzm û rasîzmî hunde kena girs!

2-Min nîvisa xo ya 27.4.1999 de niya (wina) nivis-nay bî. "Ebi reşs biyene meseleyî nêqedînê, la belê newe dest kenê ci. Ganî reşsê ma naye rind bizanê. Angorê naye xo amade bikerê. Şarê ma ganî hem reisanê xo rê bar mebo, durimê ïnan rind verê çimanê xo de bicêro û hem jî ïnan teyna neverdo" Ewro ma rojnameya Ö.Politika de problemanê reisan û şarê ma wanenîme. Nê seba ma suprîz niyê. Mesele reşsê ma û şarê ma se cewabê nînan dano, wo. Wunciya eynî nivisê xo de mi nivisnaybî ke "MHP seba zaf kesan biye suprîz. La belê ganî rind bêro zanayene ke hereketê faşistî virêndîye kolanan (küçan) de hakîmiyetê xo virazenê û bado jî ênê îktîdar. Terorê faşîstan- ke daye.ra ver jî bî, ganî teba dîroka ïnan bêro famkerdene. Her cenaze de jî biyene Kenya ra remnayena A. Öcalanî ra dime tayîna bî zêde û hetanî lînc şî. Na meseleye de dîroka îktîdar biyena Musolonî û Hitlerî zaf balantox a". Naca mesela a ya ke, kurdî ganî kolanan teslimê nê rasîstan mekerê! Eke kolân rîyê teslimê rasîstan bî, réyna pêyser guretana ïnan, şîknayêna tersê şarî zaf bina baha, gegare jî mumkun nêbena.


3-Dawaya Sedsera na aşme (meng) de dest kena ci. Îlankerdena Kongreya Neteweyî cewabêdo zaf girs o, seba na dawaye. La belê ganî pratîk de jî no cewab rind bêro dayene. Ha kongreya şarî, ha her organîzasyon û partiya kurdan, ha her kesê kurdi xo ser ro, ha têkoşîna çekdariye yew kefiyê terazî ya. Kefiyo bîn jî xo paraznayena birêz A. Öcalan û abûkatanê dê wo.

Râştiye roportajê M. Zeki Okçuoglu yo ke Hevgirtin Gulana 1999 de veciya zaf balê mi ant. La belê wunciya jî, hêviya mi nêşîkiye. Ez wazena û hêvî kena ke, nê hurdmîna kefiyê terazî yew denge virazî û hemverê kuvan û hovîyan heqa şarî mayê bindest û mazlumî, heqa birêz Öcalanî bipareznê.

Rojê roja lec û aştiye, biratî û dişmentiye, piya menden û yewbînî kıstene, barbarî û sivilîzasyonî, hovît ye û kêtibiyena. Tercîhê şarî ma belî yo. La belê seba dê ganî huna jî bedeli bêre dayene ke, hovî naye fam bikerê û xo bivurnê.

DİFOG çanda qedîm a suryaniyan raxist ber çavan

Li Hindistanê û li OHAL'ê wênekêsi ne yek e



Zülküf Çobanoğlu Selahattin Doğan Hüseyin Elçi Özgür Nizam



Endamên DİFOG'ê wekî xebata sê salan, li navenda Mêrdînê, li gundêñ Enhel, Xax, Mizîza (Midyad), gundêñ Bisorîno û Midihê (Hezex) û li gundê Venkê (Gerger-Semsûr) di gel zor û zehmetiyan kar û barê xwe birine serî.

Koma Wêneyan a Amedê (Diyarbakır Fotoğraf Grubu) DİFOG; li Stenbolê, li Wênegeha-Fujifilmê, bi navê "Anadolu'nun Solan Rengi: Sûryaniler" (Rengê Anatoliyê yê ku Diçilmise: Gelê Sûryanî) pêşangahêk saz kir. Di vê pêşangahê de rewşa Sûryaniyan tevî zenaatkariya kevirîn, seraflî, mîmârî, telkarî û jiyana çandî, bi dîmenêñ balkêş li ber çavan tê raxistin.

Koma ku ji Zulküf Çobanoğlu, Selahattin Doğan, Hüseyin Elçi û Özgür Nizam pêk tê, demekê berê pêşangahê DIA'yê ku ji heman wêneyan pêk dihat, di çalakiya "İstanbul 3. Saydam Günleri" de pêşkêşî dêhn û bala wênehezan kiribû.

Me li ser pêşangahê ku 15'ê gulanê dest pê kir û dê heta 4'ê pûşperê bidome, bi Hüseyin Elçi û Özgür Nizam re, der heqê xebatêñ DİFOG'ê û çend xalêñ din de gotübêjek pêk anî.

Di destpêkê de me xwest ku ew ji me re behsa avakirina DİFOG'ê bikin. Hüseyin Elçi wiha dibêjê: "Berê her yekî ji me kar û barê xwe bi serê xwe dikir. Li hêla din me bala xwe didayê ku li gelek bajaren bîçûk jî komên fotografan hebûn, lê her çiqas Amed bajarekî kevnare û çandê ye ji ne kom û ne ji saziyeke bi vî rengî hebû û wekî pêwîstiyekê di berfanbara 1996'an de DİFOG ji hêla me 4 kesan ve hate damezirandin."

DİFOG'ê, pêşangahê xwe ya yekemîn bi alikariya "Diyarbakır Tabib odası" yê bi navê "Fotoğraflarla Güneydoğu" di sala 1997'an de li Amedê pêk anî. Elçi û Nizam diyar dîkin ku pişte heman pêşangahê li bajaren Batmanê û Cizîrê pêk hatîye ku pişti salêñ 1980'yi carra yekemîn li van bajaran pêşangahêni bi vî rengî pêk hatine. Özgür Nizam radigihîne ku wan her çiqas hewl dabe ku pêşangahê li Amedê, li salona Dêra Meryem Ana ya Sûryaniyan vekin jî walîtiya Amedê rê nedaye yekê.

Hüseyin Elçi, helwesta rayedaran û hin saziyên wekî TÜRSAB'ê, ya li dijî çalakiyên çandî li herêma kurd, rexne dike: "Qaşo TÜRSAB (Yekitiya Acetylén Seyahatê ya Tirkîyeyê) dixwaze herêmê ji tûrîzma derve re veke. Tu dev ji tûrîzma derve berde! Pêştu rê ji tûrîzma hundîrin re veke bes e! Bihêle bila in-san bikaribin kameraya xwe bixin stûyê xwe û çanda xwe ya kevnare û pîroz bibînin û ji nifşen nû re nemir bikin!"

Özgür Nizam, pirsa me ya bi rengê: "Derbarê Sûryaniyan de, ev 3 sal in ku we berê objektifîñ xwe da-yê gel û çanda navborî. Gelo di vê pêvajoyê de zehmetiyêñ ku we kişandîn ci bûn?" wiha bersivand: "Li O-HAL'ê angò li herêmeke ku rewşa awarte lê heye, tu rabî tiştekî ji rêsê jî bikî, ew dibe tiştekî sosret û awarte. Di stûyê te de makîneyên filman hebe, ev tiştekî xe-rîb û ecêb e. Rasterast hin rayedaran digot: 'Here li Antalyâ wêneyan bikişîne, çima tu naçî wêneyen Efesê nakişînî? Li vê derê ci karê te heye?' Gelek caran tu bi eskorten leşkeri dikevî nava gund. Tu nikarî li gund tiştekî bi wan gundiyan belengaz re parve bikî. Gundî jî mafdar e, dibêjê: 'Gelo ez çayekê an qehweyekê bidi-me wan dê ev fermandar ci bîne serê min?' Pirsgrîka

bingehîn ev e. Ji bo ku mirov rewşa heyi analiz bike bersiva vê pirsê bide, divê mirov li wê cografayê bijî Li Hindistanê û li herêmê wênekêsi ne wekî hev e."

Gelo nêziktêdayîn û nêrîna gelê suryanî ci kesen jî rêsê û ci ji derdorêñ olî, li hemberî xebatêñ DİFOG'ê çawa bû? Elçi û Nizam der barê vê yekê de di hemer baweriyyê de ne: "Gelê sûryanî rasterast xwe nade be xebatêñ wiha. Rewş ji bo derdorêñ olî kambaxtir e. Dînava Deyrûzehferan û Manastira Mor Gabrielê bi xws de ji dîtin û ramanêñ cuda hene. Di warê kişandîn wêneyen avahiyen olî de astengî dernakevin, lê dema ku me dixwest dêr û sûryaniyan bi hev re bikişinîn, wa gavê pîrsgrîk derdiketin. Bawer bikin heta ku ev xebat nehatibû vê radeyê, ji gelê sûryanî bigire heta derdorêñ olî bi awayekî gumanbar li me mîze dikirin. Ji wan kîri emê wêneyen wan bi awayen nehîn bi kar bînin. Kesen li wir dijîn jî, kesen ku qaşo wan kesan diparêzin jî, ji fotografan ditirsin!"

Hüseyin Elçi, ji bo eleqe û nêrîna gelê sûryanî ya li Stenbolê jî bi awayekî sîtemkar û nerazî wisa dibêjê: "Di pêşandana DIA'yê ku me berê di festivala '3. Saydam Günleri' de pêşkêş kiribû tevî ku du rojan jî pêk hatîbû, digel vexwendina me Metropolit Yusuf Çetin besar nebû. İro jî em ketin hefteye xwe lê mixabin tevî ku me dawetname jê re

"Bi kurtî dema em rewşê vebêjin, em dikarin bibêjin ku, kesen li wir dijîn jî, kesen ku qaşo wan kesan diparêzin jî, ji fotografan ditirsin!"

şand, hê jî nehatiye. Lê li hêla din Metropolîte Deyrûzehferan Birêz Samûel Aktaş bi peyama xwe besdîfî galaya me bû û kîfxweşîya xwe anî zîmîn. Mixabîn tevî ku 15 hezar sûryanî li Stenbolê dijîn, ji wan bêhîr mîvanen me bi giştî kurd bi xwe bûn. Dêrê destûr ne-da ku em afişen xwe bi dêrê ve bikin. Kesen ku xwe wekî asûrî dibînin bi awayekî germ hatin pêşangahê lê kesen ku xwe wekî sûryanî dibînin ku bi tenê aliyen wan ên olî derdikeve pêş, xwe ji me dûr girtin.

Hüseyin Elçi diyar dike ku ev cara yekemîn e li Tirkîyeyê xebateke bi vî rengî ku navê asûriyan bi xwe lê hatîye kirin, pêk hatîye. Ew dide zanîn ku gelek derdoran xebatêñ wiha kirine, lê bi navêñ vesarî û ji bo xizmeta hin kes û saziyan. Ji bo pêşerojê plan û projeyen DİFOG'ê jî Elçi van tiştan dibêjê: "Me dil heye ku em pêşangahê li seranserê Anatoliya û Ewrûpâyê pêşkêş bikin. Li hêla din di rojêñ pêş de me dil heye ku belgesela êzîdiyan çêbikin. Lê ji bo vê yekê jî pêwîst e em xebatêñ xwe li Rojhîlat û Başûrê Kurdistanê bidomîn.

Hüseyin Elçi û Özgür Nizam diyar dîkin ku heger bibe qismet ku rojek were û ew li bajaren wekî Silêmanî, Mehabad, Zaxo, Kirmanşah û hwd. objektfîñ xwe bixebeitînin, ewê li rûyê dînyayê bibin mirovîn herî dil-şa.

Gelo ji bo van her du ciwamîran pîre fotografê ki ne? Hüseyin Elçi di cih de dibersivîne: "Ara Güler!" Wekî din?: "Çerkez Karadağ û Adem Sönmez" Ew diyar dike ku Adem sömmez bi salan e ku li Müşê wêneyen gelek hêja diafirîne.

Em dixwazin wekî gotina dawî nêrînen wan bigirin. Özgür Nizam bi taybetî dixwaze spasiyên xwe pêşkêşî Turgut Alaca bike ku bi sponsorî, alîkarî û piştigiriya wî ev pêşangahê vebûye.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ